

K.T

ZANÎNGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ

DÎWANÇEYA MELA EBDULLAHÊ QURSINCÎ.

(LÊKOLÎN & METN)

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

Mahmut DURMUŞ

ŞÊWIRMEND

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

WAN -2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

MELA EBDULLAH KURSINCI'NİN DİVANI

(İNCELEME & METİN)

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN

Mahmut DURMUŞ

DANIŞMAN

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

VAN -2019

(Teza Lîsansa Bilind)

Mahmut DURMUŞ

ZANÎNGEHA WAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
TÎRMEH-2019

(DÎWANÇEYA MELA EBDULLAHÊ QURSINCÎ. LÊKOLÎN û METN)

KURTE

Mela Ebdullah, xwediyê hafizyek bêhempa bûye ku bûyerên temaşe kiriye, vegûhestiyê teşeyek wecîz û edebî. Şîn û şahiyên civakê bi ewayek henekî di rêzên xwe de hûnandiye. Bi vî hawî ew layiq e ku navê wî di dîroka wêjeya kurdî de bê nivîsandin. Erdenîgariya ku ew têda jiyaye ji ber ku çiyayî ye, ew jî wek piraniya hemwelatîyên xwe di warê wêjeyê de xwe pêş xistiye. Hîzan, gelek medreseyan di nav xwe de dihewîne û bi vî hawî wek navenda zanistê xwiya dike.

Herwekê ku Hîzan şehreke qedîm e, bi taybetî jî di serdema Osmaniyan de navenda îlmê û paytexta medreseyan e. Hîzan, gelek medreseyan dihewîne û bûye wesîleya gihiştina pirî alim, zanyar û giregir. Bandora erdnîgariyê a li ser mirovan û di serdema Mela Ebdullah jiyaye de, hal û hewalê civakê bê vekolîn, gotinên wî û teşeya şeweya wî dê baştir bê fêmkirin.

Peyvên Sereke : Mela Ebdullah, Wêje, Civak, Hîzan, Medrese.

Hejmara Rûpelan : 122 + X

Şêwirmend : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

(Yüksek Lisans Tezi)

Mahmut DURMUŞ

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Temmuz -2019

(MELA EBDULLAHÊ QURSİNCÎ'NİN DİVANI. İNCELEME & METİN)

ÖZET

Mela Abdullah, olağanüstü zekasıyla temaşa ettiği olayları hafızasına kaydederek, onları veciz bir edebi ifadeye dönüştürmüştür. Toplumun acılarını ve sevinçlerini ele alarak trajikomik vakıaları espirili bir dille ele almıştır ve kürt edebiyat tarihine ismini yazdırmayı hak etmiştir. Yaşamış olduğu coğrafya, yapı itibarıyla dağlık ve engebeli olduğundan, ekser Hizanlı gibi o da kendini ilme adamıştır. Hizan, sahip olduğu çok sayıda medresesi ile bir üniversiteler şehri görünümündedir.

Kadim bir şehir olan Hizan, özellikle Osmanlılar döneminde bir ilim merkezi ya da medreseler diyarıdır. Çok sayıda medreseyi barındıran Hizan birçok âlimin, din adamının ve kanaat önderinin yetişmesine de vesile olmuştur. Coğrafyaların insanlar üzerindeki tesiri ve Mela Abdullah'ın yaşamış olduğu dönemdeki toplumun sosyokültürel yapısına bakıldığında onun söylediklerini ve kendisini ifade ediş tarzını daha iyi anlayabilmek mümkündür.

Anahtar kelimeler : Mela Abdullah, Edebiyat, Toplum, Hizan, Medrese

Sayfa Sayısı : 122 + X

Danışman : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

(M.Sc. Thesis)

Mahmut DURMUŞ

YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES

JULY -2019

(MELA EBDULLAH QURSİNCİ'S DİVAN. REVIEW and TEXT)

ABSTRACT

Mela Abdullah has deserved to write his name in the history of Kurdish literature thereby memorized the events by way of illustration with his extraordinary intelligence and transformed them into a terse literary expression. He approached sorrows and joys of the society during his period and addresses the tragicomic events in a humorous language. Due to the geography, is mountainous and hilly where he lived in Mela Abdullah also like a pro-Hizan committed himself to knowledge. Hizan is like a university city with a large number of madrasah.

The ancient city of Hizan, especially during the Ottoman period is a center of science and the base of madrasahs. Hizan, includes many madrasahs, also provides for the development of the scholar, the clergy and the opinion leader. When we look at the influence of geography on people and the sociocultural structure of society during the time when Mela Abdullah lived, it is possible to understand better what he says and how he expresses himself.

Key Words : Mela Abdullah, Literature, Society, Hizan, Madrasah.

Quantity of Page : 122 + X

Supervisor : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

KURTEBÊJE

| | |
|-------------|-------------------------|
| Amd. | : amadekar |
| b. | : berg |
| bnr. | : binêrin |
| hwd. | : herwekêdin |
| D.g. | : dîroka xwegihiştinê |
| r. | : rûpel |
| s. | : sal |
| hj. | : hejmar |
| TDV | : Türkiye Diyanet Vakfı |
| Weş. | : Weşanxane. |

NAVEROK

| | |
|------------------------------------------------|------------|
| KURTE | I |
| ÖZET | II |
| ABSTRACT | III |
| KURTEBÊJE | IV |
| NAVEROK | V |
| PÊŞGOTÎN | X |
| DESTPÊK | 1 |
| I. Herêma Mela Ebdullahê Qursincî: Hîzan | 1 |
| II. Medreseyên li Herêmê | 2 |

BEŞA YEKEM

1. MELA EBDULLAHÊ QURSINCÎ

| | |
|------------------------------------------------|---|
| 1.1. Kesayet û Der Barê Warê Qursincî de | 3 |
| 1.2. Mexlesa Wî | 3 |
| 1.3. Xwendina Wî | 4 |
| 1.4. Terîqet | 4 |
| 1.5. Zewaca Wî | 5 |
| 1.6. Wefata Wî | 5 |

BEŞA DUYEM

2. VEGÊRAN (ANLATIBILIM)

| | |
|--------------------------------------------------------|---|
| 2.1. Ji Hêla Zanista Vegêranê ve Şêweya Qursincî | 6 |
| 2.2. Der barê Vegêranê de | 7 |

BEŞA SÊYEM

3. TEHLÎLA METNÊ

| | |
|----------------------------------------------------|-----------|
| 3.1.UNSÛRÊN DÎNÎ..... | 11 |
| 3.1.1. Navên Xwedê | 11 |
| 3.1.2. Xweda..... | 11 |
| 3.1.3. Navê “Rebb”..... | 12 |
| 3.2. PÊXEMBER, KESAYET Û TÊGEHÊN DÎNÎ | 13 |
| 3.2.1. Hz. Muhammed (s.a.w) | 13 |
| 3.2.2. Yûsûf û Zûleyxa | 14 |
| 3.2.3. Ebdulqadîr Geylanî (Xewsê Nûrîn)..... | 16 |
| 3.2.4. Loqman..... | 16 |
| 3.2.5. Qiyamet | 17 |
| 3.2.6. Sûnd..... | 18 |
| 3.2.7. Hûrî..... | 18 |
| 3.2.8. Perî..... | 19 |
| 3.2.9. Mewt (Mirin) | 20 |
| 3.2.10. Fetwa | 20 |
| 3.2.11. Bext, Talih | 21 |
| 3.2.12. Zebanî..... | 22 |
| 3.2.13. Qebr | 22 |

| | |
|-----------------------------------------------------------------|-----------|
| 3.3. UNSURÊN XWEŞİKBÛNÊ YÊN EVÎNDAR..... | 23 |
| 3.3.1. Por (zulf, bisk)..... | 23 |
| 3.3.2. Çav (Çeşm)..... | 23 |
| 3.3.3. Rû (Sîma)..... | 24 |
| 3.3.4. Xal û Xet..... | 25 |
| 3.3.5. Gerdenzer, Zerî..... | 25 |
| 3.3.6. Nazik, Qenc, Delal | 26 |
| 3.3.7. Qamet (bejn û bal)..... | 26 |
| 3.4. ÇÎROKÊN EVÎNÎ YÊN KU DÎ METNÊ DE DERBAS DÎBÎN | 27 |
| 3.4.1. Ferhad û Şîrîn | 27 |
| 3.4.2. Mem û Zîn | 28 |
| 3.5. UNSÛRÊN TEBÎETÊ: ÇAR UNSÛR | 29 |
| 3.5.1. Av | 29 |
| 3.5.2. Ax | 30 |
| 3.5.3. Agir, Ateş, Nar | 30 |
| 3.5.4. Hewa..... | 31 |
| 3.6. UNSÛRÊN KOZMÎK | 31 |
| 3.6.1. Felek | 31 |
| 3.6.2. Felek û Afîrîna wan | 32 |
| 3.7. UNSÛRÊN DEMÊ..... | 33 |
| 3.7.1. Fesl û Eyyam | 33 |
| 3.7.2. Bihar, Havîn, Payîz û Zivistan | 33 |
| 3.7.3. Şev û Roj | 34 |

| | |
|--------------------------------------------------|-----------|
| 3.8. UNSÛRÊN HEYWANATÊ | 34 |
| 3.8.1. Çûk, Teyr, kew | 34 |
| 3.8.2. Bilbil | 35 |
| 3.8.3. Teyrê Ribatê | 35 |
| 3.8.4. Şêr/Esed, Piling | 36 |
| 3.8.5. Sûleban/Rovî | 37 |
| 3.8.6. Gur | 37 |
| 3.8.7. Kêç û Pêşû | 38 |
| 3.8.8. Hesp û Hêstir | 38 |
| 3.9. UNSÛRÊN NEBATÎ | 39 |
| 3.9.1. Gul/Çiçek | 39 |
| 3.9.2. Rihan | 40 |
| 3.9.3. Dar/Daristan | 40 |
| 3.9.4. Heliz, Zivrik, Giya | 41 |
| 3.10. ALAVÊN ŞER | 41 |
| 3.10.1. Tivingê bêşliyan, Tiving | 41 |
| 3.10.2. Çek, Sîleh | 42 |
| 3.11. UNSÛRÊN DERBARÊ JIYANA ROJANE | 42 |
| 3.11.1. Dexl û Titun | 42 |
| 3.11.2. Birinc | 43 |
| 3.11.3. Kebap | 43 |
| 3.12. ÇEND UNSÛRÊN CIH Ê QEWMAN | 43 |
| 3.12.1. Kelha Nemrut | 44 |
| 3.12.2. Ermenî | 44 |
| 3.12.3. Qureyşî | 44 |
| 3.12.4. Aşiqê Cizîrê | 45 |

BEŞA ÇARAN

| | |
|-------------------------------------------------------|------------|
| 4. MENZUMEYÊN MELA EBDULLAHÊ QURSICÎ..... | 46 |
| 4.1. Çûna Waran | 48 |
| 4.2. Geliyê Êrûn | 58 |
| 4.3. Mirîşkê Şebab | 68 |
| 4.4. Kerê Hirço | 72 |
| 4.5. Sêydayê Mele Şefîq | 78 |
| 4.6. Nêçîra Mele Şefîq Ê Hevalên Wî..... | 82 |
| 4.7. Helbesta Mela Eyyubê Oreki a li Ser Qursinc..... | 88 |
| 4.8. Geliyê Behrê, Ser Qesîda Mela Eyûb | 92 |
| 4.9. Taştöp | 96 |
| 4.10. Şerê Dêrkê | 102 |
| 4.11. Deweta Mela Muşerref | 104 |
| 4.12. Şerê Qıbrısê | 110 |
| ENCAM..... | 118 |
| SONUÇ..... | 119 |
| CONCLUSION..... | 120 |
| ÇAVKANÎ..... | 121 |

PÊŞGOTIN

Li devera Bedlîsê gelek şexsiyetên girîng derketine ku di warê wêjeya kurdî de berhemên giranbiha dane. Di serdemên dîrokî de û taybetî di serdema Osmanîyan de feqeyên li medreseyan vî bajarê gihiştine, şûnpêyek girîng û pêngavek mezin avêtine ji bo wêjeya Kurdî. Di navbera Hîzan û Miksê de newalek pir dirêj û li derdorê vê newalê mîna Medreseya Taxê û Medreseyan Xeydayê hene. Mela Ebdullahê Qursincî jî wek Feqe Mihemedê dildarê Sînem, yek ji wan dildarekê ji vê newalê ye. Herwiha gelek berhem û Şexsiyetên hêja di dîrokê de li ser vê erdnîgariyê derketine ku li benda lêkolînerên çavhurgîlî ne.

Emê jî li ser şexsiyet û dîwançeya yek ji van kesan, li ser Mela Ebdullahê Qursincî bisekinin. Emê çarînên wî yên di derbareyê weqian de û helbestên wî li vir rave bikin ku bila qetreyek di cêra wêjeya Kurdî de zêde bibe. Pêyvên herêmî û têgehên di nav çarînan de derbas dibin di jêrenotan de hatine ravekirin. Herwiha hêvîdarim ku dê berhemên wî di nav wêjeya kurdî de cih bigre û gel ji van hizran sûd wergire. Em di wê qeneatê de ne ku xebata bi van eweyan ku tên kirin hizra gel berfireh dike û nêrînek cûda bide ber çavên wêjezanan.

Qursincî, di dîwançeya xwe de bi piranî wekê mijar, li ser bûyer û serpêhatiyên li derdorê qewimiye derbazê nezmê kiriye. Ji bo rave û têgihiştina van bûyeran, bi biraziyê Mela Ebdullah, dildarê wêjeya Kurdî Said Yaraşli re me hevpeyvîn pêk aniyê. Di dîwançeya Qursincî de, di bin 12 serenavan de helbest hatine nivîsandin. Me di nav teze de li ser serê her helbestî de H: (1), H: (2), H: (3) û hetanî helbesta dawîn H: (12) nivîsandiye û di nav teze de wextê ku ji helbestan mînakek hat dayîn li gor van nîşaneyan ji rêzê ve di kîjan helbestê de derbaz be hatiye diyarkirin û li rexê hejmarê helbestê jî hejmarê malikan hatiye nivîsandin. Bo nimûne, H: (11/4) tê wateya helbesta yazdemîn, malika çaran. Di nav metnê de pêyvên biyanî û herêmî hatine ravekirin û carinan ji hêla nûansên di navbera herêman de hatine ravekirin.

Tez ji çar beşan pêk tê û di beşa yekem de qala jîyan û serpêhatiya mela Ebdullahê qursincî hatiye kirin, di beşa duyem de şeweya Qursincî ji hêla vegêranê ve hatiye nirxandin û di beşa sêyem de jî, ji çavkaniyên cur bi cur helbest hatine şîrovekirin, unsûrên di helbestan de ji hêla wate, mêjû û wêjeyê ve hatine şîrovekirin. Di beşa çaran de jî helbestên Qursincî ji tîpên Erebi transkiribê tîpên latînî hatine kirin û nivîs bi metna resen hatine dayin.

DESTPÊK

I. Herêma Mela Ebdullahê Qursincî: Hîzan

Şehrê qedîm Hîzan, bi taybetî di serdema osmaniyan de navenda zanistê û newala medreseyan e. Hîzan gelek medreseyan di nav xwe de dihewîne û bûye sedema gihiştina gelek alim, zanyar, giregir û pêşengan. Ji hêla rewşembîriyê ve di vê cihê adan de mîna kesên Seîdê Nûrsî, Molla Xelîl, Arvasî, Taxî, Varkanîsî alim, zanyar û rewşembîr gihiştine.

Hîzan ji Hîtîtîyan heta niha navendek medenîyetê ye. Li gor tomarên dîrokî ji salên 2000'î beriya mîladê niştecihên mirovahiyê li vê derê tê zanîn. Bi Hîtîtîyan ev destpêka niştecihiya mirovahiyê, bi serdestiya Persiyan, Romayê, Bîzansê û bi serdestiya Ereban berdewam kiriye. Hîzan, di sedsala 11'ê de Selçuklu, di sedsala 16'ê de serdema Osmaniyan jiyaye. Hetanî sedsala 19'an Hîzan, gundek bi bajarê Erziromê ve navçeyek Mûşê û bi taxa Bedlîsê ve girêdayî bûye. Di sala 1919'î de bi guherîna hin zagonên derbareyê bajar û navçeyan Hîzan, bûye qezayek Bedlîsê û bi Bedlîsê ve hatiye girêdan.

Hîzan cara yekem di tomaran de bi navê “Arart” ê hatiye dîtin û bi îhtîmalek mezin vê navê Urartuyan bikaraniye. Piştî Farsiyan bi navê “Seherhîzan” ku tê wateya “ji seherê şiyar dibin” lê danîne û wiha hatiye tomarkirin. Piştî bi navê “Hizan” hatiye kurtkirin û cihê ku “gelê wî zû şiyar dibin” derbasî dîrokê bûye. Rêveber û dîrokzanê navdar Şeref Xan (1543-1604) di sala 1597 de berhema xwe ya navdar di Şerefnameyê de sedema vê navê wiha rave dike: “Gelê vê taxê bişev û ji seherê radîbin û bi îbadet û ji îçtînabê gunehan, îtîmad û bi dîndariyê navdar bûne.”

Ev navdarbûn di nava kesên ku li Hîzanê dijîn de vegûhestiye wek nasnameyek. Hîzan îro jî bandora wê mîrasa xwe yê kevnare di nav gelê xwe de dide xûyan. Sedema helîmbûn û xwîngermiya gelê vê derê, ew e ku, di navendên îlmê, medreseyan de alim, zanyar pêşeng û giregirên pir baş ji vê derê derketine. Navê Hîzan navçeya ku niha mevcud e hatiye barkirin, navê cihê kevin wekê (Nefs-î Hîzan) yanê Hîzana bixwe ya esas, ewil hatiye pejirandin.¹

¹ Hasan Çiçek, “Bir Mekân Hizan: İlim Ve Âlim Havzası”, *Müsbet Hareket Sayısı*, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Hejmar: 1, Wan, 2016, r. 190.

II. Medreseyên li Herêmê

Îro ku navçeya bi navê Hîzan tê zanîn, di serdema Osmaniyan de mîrektîyên Sipayirt, Axxîs, Kêsan, Nemiran dihewand.

Hîzan di vê erdnîgariyê de ciheke qedîm a navenda çand û perwerdehiyê bûye û herdem jî vê taybetiya xwe parastîye. Şehrê qedîm Hîzan, bi taybetî jî di serdema Osmaniyan de yanê ji sedsala 16'ê hetanî serê sedsala 20'î bûye navenda çand û perwerdehiyê. Di van sedsalan de Hizana kevin (Nefsî Hîzan) (îro Xeyda ye), şehreke medreseyan e. Li vir; Medreseya Îsivê Welî, Medreseya Mîr Dawud, Medreseya Atîkê, Medreseya Meydanê, Medreseya Şehzadeyê û Medreseya Sîgalê; digel vê Medreseya Taxê di dawîya sedsala 18'ê de ku dest pê faliyetê kiriye û alimên vê qonaxê û zanyar û rewşembîran li deryaya îlma me zêde kirine. Di medreseyên mîna Tax û Meydanê de alimên gelek bijarte hatine gihiştin. Di vê serdemê de medreseyên herêmê ji bo perwerdehiyê cihên baştirîn bûn û ji bo pêdiviya herêmê şexsîyetên kemilî û bijarte ji van medreseyan derdiketin.

Medreseyên herêmê, hetanî sedsala 20'î faaliyetên rewşebîriyê pêk aniye. Mîrektiyên Kurd ê girêdayî Osmaniyan, li herêmen xwe gelek medreseyan ava kirine. Îro jî li herêma ku bi navê Hîzan tê nasîn, di serdema Osmaniyan de gelek medrese hatine avakirin û dewlemendiya jiyana zanista herêmê pêk anîne. Medreseyên Hîzanê tenê nedibûne wesileya gihiştina alîm an jî melayan, di heman demê de ji medreseyên din re jî çavkanî dibûn. Çawa ku hin şehrên îro çend hep zanîngehan di nav xwe de dihewînin bûne navenda perwerdehiyê, bi taybetî jî Nefsî Hîzan (bi navek din Xeyda) ku li derdorê sûran, di serdema Osmaniyan de wek şehreke zanîngehan bû. Digel pejirandina misilmaniyê ya herêmê, medrese derketine holê û ji sedsala 16'ê şûnde zêde bûne û medreseyên adan hatine avakirin. Lê di sala 1924'ê de bi zagona Tevhîd-î Tedrîsatê ev medrese bandora xwe winda kirine.²

² Çiçek, r. 191.

1. MELA EBDULLAHÊ QURSINCÎ

1.1. Kesayet û Der Barê Warê Qursincî de

Ebdullahê Qursincî li gundekî Hîzanê bi navê Qrusincê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Feqe Mihemed, navê bapîrê wî Mela Mistefa ye. Qursincî, di zanistên medreseyê de zêde peş neketiye, lêbelê di warên telîfa menzûmeyan û vegotina bûyeran de xwediyê şîyan û hunermendiyeke mezin bûye. Bi Qursincî re hafizeyeke gelekî bihêz hebûye. Çi bûyereke ku bi serê wî de hatiye, digel hemû hûrgiliyan di heman gavê de derbasî nezmê kiriye. Bi qasî 20-30 menzûmeyên wî hene ku di her yekê ji wan de bûyereke neqil kiriye. Ji vî aliyê ve Qursincî wekî waqanûsekî ku bûyerên herêmi nivîsandiye dikare bê hesabandin. Divê ev jî bê gotin ku mîzah, hicîw û nukte rengê sereke yê menzûmeyên Qursincî ye. Ev reng di hemû menzûmeyên wî de derdikeve pêş.

Aliyekî di yê hunermendiya Qursincî ew e ku di pêşkêşkirina bûyeran û nimandina dengên zarok, mezin, jin, mêr û her cure tiştî de hêzeke wî ya mezin hebûye. Loma ew wekî şanogerekî girîng ê serdema xwe tê hesabandin. Dikare bê gotin ku di vî warê de ew kesekî nadir bûye.³

Qursincî, li warê xwe û li derdorê xwe hertim bi ehlê îlmê re têkildar bûye û her tim bi wan re di nav mûnazare û gengeşeyên îlmî û edebî de bûye. Hîzan ji vî aliyê ve navenda medrese, îlm û aliman bûye. Gelê vî derê, zarok û sibyan, çî mezin çî biçûk teqez riya wan demekê di nav van medreseyan re derbas bûye û tasek dewê van medreseyan vexwarine. Ji vî hêlê ve Hîzan di nav erdnîgariya Kurdan de cihek bêhempa ye.

1.2. MEXLESA WÎ

Mela Ebdullah, ji ber ku heta deh bavan hemû mal mela bûne wekê Ebdullahê Mela hatiye gotin û nîsbetê ber bavê wî û malbata wî ve hatiye kirin. Li devera ku jiyaye gel jê re mexlesên wekê Ebdullahê çilziman, Ebdullahê Bêziman û Ebdullahê Bilbil gotine û ji van gotinan hemû jî di nav xwe de mecaz dihewînin.

³ Abdurrahman Adak, "Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmi: Nimûneya Herêma Bedlîsê", *The Journal of Mesopotamian Studies*, c.I/I, Mardin 2016, r. 42.

Ango ji gotina “Bêziman” meqsed dijwate ye. Ji teşbîha “çilzimanîyê” dide nîşan ku Qursincî vebêjerek hosta bûye; dîsa teşbîha “Ebdullahê Bilbil” di vê babetê de angaştî derbarêyê hostabûna wî ya vegotinê îsbat dîke.⁴

1.3. XWENDINA WÎ

Hetanî dawîya serdema mîrektîyan li erdnîgariya Bedlîs, Botan, û derdora wê perwerdehî bi piranî di medreseyan de pêk dihat. Demeke gelek dirêj medrese navenda perwerdehiyê bûne. Ji hêla tehsîla îlmî û edebî ve medreseyan li herêmê roleke xwe ya gelek girîng hebûye. Lê kesayet û fitrata Mela Ebdullah di medreseyan de xwendinê re guncav nebûye.

Hin meriv hene ku di bin pergalekê bi nîzamî de ji xwendinê gelek hez nakin; bixwe bixwe gerîn, vekolîn û hînbûn li gorî van kesan e. Ew jî xwedî fitrateke bi kelecana û lez û bez bûye. Mela Ebdullah di medresê de kêma xwendiyê, di warê xwendin û tehsîla medresê de zêde xwedan îlm nebûye, lê wextê ku meriv bala xwe dide berhama wî, dide xûyan ku haja wî ji dersên medreseyan hebûye. Mela Ebdullah li medreseyan ji xwendinê zêdetir wek seyyahek piranî bi medrese medrese geriyaye bi ehlê medreseyan re tekiliyên xort daniye û Jixwe di çarînen xwe de qala neçîr û hevalbendiya gelek melayên medreseyan dîke. Mela Ebdullah bîngeha xwe ji gerîn, têkilî û mûnazarayên bi ehlê medresê girtiye. Mela Ebdullah zêdetir wextê xwe bi ehlê medresê re derbas kiriye.

Lê herwiha helbestên Melayê Cizîrî Mem û zîn xwendiyê û hakimê menaya van helbestan bûye. Di bandora Seyîd Eliyê Findikî de maye û bi vî hawî di Qesîdeya Waran de fanîbûn û derewîna dinyayê vedibêje. Digel vê yekê Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî xwendiyê û dengê helbestxwendina wî jî tomarkirî ye û têgihîştîye piraniya şîrove û wateya van helbestan. Şêweya helbestên Mela Ebdullah jî rastî helbestên Kurdiya klasîk tê.⁵

1.4. TERÎQET

Terîqeta Neqşebendîyan, navê terîqeta ku ji aliyê Bahauddîn Muhemmed el-Buxarî va hatiye sazîkirin. Ev terîqeta hanê bi ewayeke mîsoger, girêdayê Quranê û sunnetên Pêxember bûye, lewra di navbera misilmanan de bi ewayeke berfireh belav bûye. Şahê neqşebend vê terîqetê weha pênase dîke: “ Rêya me, rêyeke were ye ku zor tê dîtin, xelegeke zexm e,

⁴ Jêder: Hevpeyvîn, Said Yaraşlı, 21.10.2018, Bedlîs, Tetwan.

⁵ Jêder: Hevpeyvîn, Said Yaraşlı, 21.10.2018, Bedlîs, Tetwan.

armanc tenê destgirtina sunetên Resûlê Xwedê ye û şopandian riya sehabiyên wî ye. Selat û selam li ser Resûlê Xwedê û sehabiyên wî be.⁶

Li herêma Hîzanê zêdetir di medreseyan de terîqeta neqşîbendiye hatiye pejirandin. Lê di dawiyê de terîqet ji ber ku ji safiyeta xwe dûr ketin û zêdetir erka wan guherî û kete bin bandora şêxan; gelek alim û mela jî ji terîqetê sar bûne. Berjewendî û bikaranîna terîqetê ya ji bo tiştên dunyawî bûye sedama dûrketina gelek insanan. Ji vê hêlê ve terîqet Mela Ebdullah celb nekiriye û malbata wî jî mûntesîbê terîqatekê nebûne. Lê malbata wî hetanî deh bavan mal mela bûne. Her tim jiyana bav û kalên wî bi perwerdehiya feqeyan di medreseyan de derbas bûye.⁷

1.5. ZEWACA WÎ

Mela Abdullah tenê carek zewiciye û Ji yek hevserê yazdeh zarokên wî hene û hêj zarokên wî dijîn. Zarokên wî an niha jî li cihên cûr bi cûr jiyana xwe didomînin. Gundekî nêzikî gundê xwe ji Qemsar zewiciye, bi evîntî zewiciye û ji vî zewacê yazdeh zorokên wî hene.⁸

1.6. WEFATA WÎ

Mela Ebdûllah di 56 saliya xwe de wefat kiriye. Texmînî di sala 1991ê 17 cotmehê de koçî dawîye kiriye. Birayê mezin ê Mela Ebdullah nêzikî wefata xwe, xewna Mela Ebdullah dibîne û di vî xewnê de Mela ebdullah dibêje birayê xwe “Were du odeyên me hene, odeya te ji ya min çêtir û firehtir e” li ser vê xewnê birayê mezin jî wesîyet dike ku bila gora wî jî li kêleka Mela Ebdullah bê çêkirin û herdu jî li kêleka hevdu di goristana gundê Qûrsinc de hatine definkirin. Him li ser gora wî, him jî di dawîya qesîdeya Çûna Waran de ev çarîna manîdar hatiye nivîsandin.⁹

Sed sal tu umur kî bimînî dinê

Rojek dê bibînî zewqa mirinê

Guhê xwe nedin vî dinya bê wefa

Nema ew ji bo Muhemmed (S.a.v) Mistefa.¹⁰

H:(1/23)

⁶ Nesim Sönmez (2018), *Dîwana Şêx Muşerrefê Xînûkî*, Çapa 1ê, Weşanên Seyda, Diyarbakır, r.10.

⁷ Jêder: Hevpêyvîn, Said Yaraşlı, 21.10.2018, Bedlîs, Tetwan.

⁸ Jêder: Hevpêyvîn, Said Yaraşlı, 21.10.2018, Bedlîs, Tetwan.

⁹ Jêder: Hevpêyvîn, Said Yaraşlı, 21.10.2018, Bedlîs, Tetwan.

¹⁰ Jêder: Hevpêyvîn, Said Yaraşlı, 23.10.2018, Bedlîs, Tetwan.

2. VEGÊRAN (ANLATIBILIM)

Aliyekî din ê Qursincî vegotin e; Qursincî vebêjerek hosta bûye ku ev şêweya wî bi aliyekî din ve rastî zanista vegotinê tê.

2.1. Ji Hêla Zanista Vegêranê ve Şêweya Qursincî

Li gor Gerand Genette ku bingeha vê zanistê ava kiriye dibêje; vegotinek ji agahiyên xwe kêmtir tişt vedibêje, lê daîma ji gotinên xwe zêdetir tişt vedigûhêze guhdarvanên xwe. Zanista vegotinê bi navek din Naratolojî; lêgerîna wêjeyî ya ku metodên şêwazî vedikole ye. Şêwe, ji bo ghiştina armancek rêya ku hatiye pejirandin e. Şêweya Qursincî û metoda ku bi kar aniyê vegotinek Jixweberî (doğaçlama) ye. Di heman demê de ji bilî vê şêweyê Qursincî bi ewayek wêjeyî van vegotinan bi hostatî honandiye. Li gor Gerand nîvîsarek ku tiştê vedibêjê teqez dixwaze peyamek ragihîne. Lê dibêje bêguman dê ev peyamek bi rêya teknîk û şêweya nîvîskar bê veşartin. Di piraniya vegotinan de hingê pirsgerêkên civakî pirsgerêkên ronîkirina derûniya şexsî jî pêşber e.

Qursincî di vegotinên xwe de li ser van herdu hêmanan gelek sekiniye. Yek pirsgerêkên civakî ya duyem jî kemilîna şexsî ye. Bo mînak di vê rêza “Guh bidenê gelê biran hûn xelkê vê civatê, Şairek ji me rabû, şûbhê kewê ribatê Dixwîne d’meclîsan da, her ziman û lûxatê, Binêr ka çi hat ser me, îsal heyva sibatê. Xudê tu xirab bikey, mala fesadê vî welatê..” da li ser fesadbûn û pirsgerêkek gelemperî sekiniye ku ev pirsgerêkek mezin a civakî ya herêmê ye.

Dîsa di heman perspektîfê de Qursincî dibêje, “ Hin aşîq in, hin dengbêj in, Wesfê me pir şaş dibêjin. Milletek pir xayîn e.” Tê dîtin ku Qursincî van pirsgerêkên civakî derdixîne pêşber û peyamên civakî dide.

Li gor teoriya Genette; (vebêj)vegêr li ser xêzeke rasteqîn û yekpare nîne. Carinan kronolojî xirab dibe, bûyer û têgihîn û raman di dîmenên cûda de tê vegûhestin. Hingê dengê vebêjerê çavên temaşevanan û hafîzeyê têgihînê jî hêmanên çalak in. Bi saya bikaranîna van hêmanan a di qadên cuda de, naveroka vegotinê, asta vegêrê baştir tê fêmkirin. Herwekêdin vebêjer di nav van kronolojiyê xirab de dikare cih û warên ku qet nedîtî jî teswîr bike.

Wekê mînak Qursincî di beşa Şerê Qibrîsê de qala cih û warên ku hîç nedîtîye dike û bi awayek xeyalî bajarê Qibrîsê û çiyayên wî vedibêje. Di wextê sefara Qibrîsê de xortên wê demê ji bo cengê dihatin pejirandin û kesên ku heta di temenekê ciwan de bûn ji hêla sazîyên fermî yê lêşkerî ve agahnameyek dihate şandin û ew xort nîvmecbûrî beşdarê seferê dibûn. Di

wê demê de ji Mela Ebdullah re jî agahnameyek bi vî hawî tê lê, bes nav û naveroka vê bajarê dibihîze, qet naçe wê derê. Lê di amadehiya seferê de wekê ku çûyî wê derê, teswîr dîke û bi awayek xeyalî nav û naveroka bajarê Qibrîsê vedibêje û li ser zor û zehmetiyên cengê û seferê disekine.

Belê rabûm sûbhekî çûme wilayetê qezayê

Me xwe nivîsî Qibrîs em ketine belayê

Sefera me giran e dê rabin biçine xezayê

Ah û hesret û dîtina me bû xuçk û birayê

Ji memleket rabûn derketin hatine vira

Hatine em xurbetê ketine destê gawira

Ji Beş parmak daxlarî b'lefkoşa bû sê gira

Ah û hesreta me bû, dê û bab û xuçk û bira.

H: (12/3-6)

Di rêzebûyerên Qursincî de esasen babetek rasteqîn di nav cih û demekê de bi çîrokî tê vegotin. Mem û Zîn, Şexê Senan û gelek çîrokên navdar, berî nezm û helbestê, ewilîn çîrok bûn, di nav gel de bi awayek devkî û bi riya vegotina çîrokê gihiştîye destê hostayên xwe û bi ewayek edebî û helbestî di destên adan de û bi saya hişên dûrbîn ve wek helbest hatine honandin.

2.2. Der barê Vegêranê de

Vegêran (narrative/anlati) ji helbestê cihêtir “çîrokekê” qiset dîke. Çîrokeke ku tê de karakter hene, li wan tiştek diqewime, ev rûdan di nav dem (zeman) û cihekî (mekan) de pêk tê û ev hemû bi riya vegêrekî tînetkirin.

Gerard Genette, ku serê xwe bi vê meselê gelek êşandiye sê ferq û nûans kirine nav wateyên vegêranê:

I. Gotara nivîskî û devkî ya ku bûyer an rêzebûyerekê qiset dîke.

II. Sîlsîleya bûyerên rasteqîn an xeyalî yê ku teorîsyenên vegêranê tîkiliyên xwe analîz kirine.

III. Bûyerên ku di kêliya kiryara vegêranê (act of narrating / anlatılama edîmî) de ji aliyê neqalekî/vegêrekî ve tê meydanê.¹¹

Ev taybetî aliyên cihê yên vegêranê bin jî, ger bal kişandibe, di her sisêyan de “bûyer” xaleke hevpar e. Lewma dûrî aqil nîne ku xwe di qalibê çîrokekê desaz dike! Bi vî halê xwe vegêran, nêzikî zagonên jiyânê ye, jiyana ku tê de her roj çîrokek tê serê me: “Te îro çi kir?”, “Te digot di eskeriyê de çavekî kalikê te kor bûbû?”, “Ji bo çûna geşt û seyranê em ê sibê haziriyeke çawa bikin?”... Yanê “serpêhatî” qalibê vegêranê ye. Ger wateyek din lê zêde bûbe û ew îro bûbe têgehek, ev rewş ji dîroka edebiyatê xafil nîne. Ji salên 1960î vir ve li Ewropayê, vegêran, bêtir ji bo metnên çîrokî hatiye bikaranîn. Yanê pêyva vegêranê, bi piranî ji bo cûreyên wekê çîrokê hatiye emilandin. Bi serdestbûn û pêşketina çîrok û romanê re jî bûye objeyeke xebatên çandî û edebî. Ji van xebatan jî zanistekê nû, vegêrannasî(narratology/anlatıbilim), derketiye.

Ger şîrovevên derbareyê Poetikaya Arîsto de ji hed derneketî bin (ne şîrovevên bêhed bin), dûvikê vê meseleyê jî heta Antîk dijene. Li gor Onega û Landa ev berhem belê, xwe bi ser tragedyayê de xwahr kiribû lê ji bo cûreyên xwedî-rêzebûyer jî dikarîbû bihata bikaranîn û ji vî aliyê ve ew despêka vegêrannasiyê bû. Poetikayê du pênase anîbûn ji bo vegêranê: Di wateya fireh de ew berhemên ku xwedî rêzebûyereke bûn û di wateya teng de ew berhem bûn ku ji aliyê vegêrekî ve dihatin qisetkirin.

Bi rastî jî ev her du alî (rêzebûyer û vegêr), taybetiyên bingeşîn ên vegêranê ne. Îro bi navên cihê bi cihê bîna temsîlîkirin jî mesele sade ye. Di nav ew qas teferuatên hûr de, yên gir ev in. Çawa ku Manfred Jahn jî dibêje hemû teoriyên vegêranê du tiştan ji hev cuda dikin: “çi” tê qisetkirin(çîrok) û “çawa” tê qisetkirin(gotar).

Vegêr çi ye, bi kurtî mirov dikare bibêje “Navbeykar”. Navbeykarê ku di navbera du nivîskar û xwendevanan de tîkiliyekê datîne. Yanê hêmaneke roman an çîrokê ye kubûyer, diyarde an rewşekê neqlî xwendevanan dike! Bi qewlê Meike Bal, ew “amrazeke vegêranê” ye, nivîskar xwe bi paş ve dikişîne, ji xwe re berdevkî diafirîne û pêçîroka xwe qiset dike. An wekî ku Wood jî dibêje, gelek şîbakên çîroksaziyê hebin jî du anten negot sê deriyê wê hene. Mirov dikare çîrokekê bi şexsê sêyem, bi yê yekem û mînakên serkeftî yên wê kêmbin jî bi şexsê duyem dikare qiset bike; hemû mesele ev e.¹²

¹¹Remezhan Alan (2015), *Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern*, Çapa 1ê, Weşanên Peywend, Stenbol, r. 116.

¹²Alan, r. 116.

Lê xwezî mesele ewqas basît bûya! Nîne, ji ber ku ji Arîsto vir ve wesfên metna edebî serê rexnegiran mijûl kiriye: Terza dramatîk bi xwe re “nîşandanê” ya vegeranê jî “qisetkirinê” anîye. Bi gotineke din, li alîyekî resimkirin, li aliyê din neqîlkin ango li milekî sehnekirin, li milê din xûlesekin. Bêguman bi vegêrana modern re ev terz cihêrengtir û girîftir bûne û derbasokên navbera wan nermtir bûne. Mesela îro behsa vegêr bêtir bi “mesafe” yê re eleqedar tê dîtin. Mesafeya ku di navbera nivîskar, vegêr, karakter û xwendevanan de rû dide. Lewma wek ku Booth jî dibêje vegêrana ku ji aliyê şexsê yekem an şexsê sêyem ve hatiye qisetkirin, derbareyê girîngiya metnê tu tiştî nabêje, jixwe gelek caran ev ji hev bi xetên gelek stûr jî nehatine veqetandin. Carna di nav vegêrana şexsê sêyem de yekî ku bi devê yekem xeber dide heye û carna jî di vegêrana şexsê yekem de cihekî berfîreh ê şexsê sêyem heye. Pîvan di ferqa mesafeya navbera nivîskar, vegêr, karakter û xwendevan de ye: ka ji aliyê ehla, estetîk, raman û têkiliyêke fîzîkî ve diyaloge çawa di nav wan de çêdibe. Wê demê çen vegêren ku em ji wan re bibêjin nivîskarê zimmî (kesayata duyem a nivîskar), vegêre dramatîzekirî (yê ku bi qafî karakterekî zindî ye), vegêrê nedramatîzekirî (yê ku di nav çîrokê de cih nagre lê hebûna wê tê hîskirin), vegêrê pêbawer (yê ku li gor normên metnê xeber dide û tevdigere), vegêrê pênebawer (yê ku lor normên berhemê tevnagere, ji wesfên xwe wedetir herket dike, bi gotineke kurmanciya gewr, ew ê ku lingêxwe ji bêrika bavê xwe zêde diavêje) diwêlidin.

Vegêr malê hewldaneke çîrokî be jî bi qasî însanekî zindî û rasteqîn dikare were xêzkirin. Nivîskarê ku xwedayê jiyana wan a derûnî ye xwediyê qudrêtê ye. Ew jî zindî ne. (kî dikare bêje Zeno bi qasî însanekî ne zindî ye?) Elbet bi mecazî zindî ne vegêr, di nav dinyaya edebî de. Nexwe piştî mirina wî dê li tu goristanê gornek tunebe jê re! Lê ruhê afirîneriyê netîştêkî şematîk e. Lewma di metna herî sar de jî (ya ku mesafeyêke mezin ketiye navbera xwendevan û vegêr) şexsiyeta vegêrekî çav dike mirov. Dîsa jî ev yek têrî nake ku em wî aîdî dinyaya xwe bibînin. Nexêr, ji ber ku seba vegêr ji aliyê nivîskarekî ve hatiye afirandin, sîya nîne li ser rûyê erdê, di nav diyaya çîroksaziyê de hikm û qewareyêke wî heye. Têkiliya ragihandinî (bîldîrîşsel îlişkî) ya ku pêk tîne, di nav metnê de xwediyê cihekî ye. Rola wî ya sereke çi ye? Gotara vegêranê ye. Belê rola vegêr ew e ku gotara vegêranê pêk bîne. Ev yek belkê di asta jiyânê de ne tiştêk e, lê di ya vegêranê de gelek tişt e. Ji ber ku vegêr navbeynkarekî aktîf e; qerar dide ka dê çi bi dûvdirêj bîn qisetkirin, çi bi kurtî bîn neqîlkin, çi dê di navenda metnê de bin, çi li qeraxê wê bîn hiştin.¹³

¹³ Alan, r. 117.

3. TEHLÎLA METNÊ

3.1. UNSÛRÊN DÎNÎ

Di nav metnê de ji hêla dînî, nebatî, tesewufî, evînî û hwd. gelek bêje û pêyvên cuda hatine bikaranîn ku hin ji wan di hunerên edebî de û hin jî di wateyên xwe yên rasteqîn de hatine bikaranîn. Raveya unsûrên dînî, daxuyaniya têgehên razber û manewî dihewîne.

3.1.1. Navên Xwedê

Navên Xwedê, navên herî xweşik in. Ji ber vê ji wan re “Esmâu’l-Husna”, yanê navên xweşik tên gotin. Di Qur’anê de Xwedayê Tea’la dibêje ku “navên herî xweşik, ên Xwedê ne. Wê demê jî wî re bi van navan dua bikin û wan kesên ku li ser navên Xwedê ji rê derketine, berdîn.”¹⁴ Tê qebûlkirin ku 99 navên bingehîn ên Xwedê hene.

Ji sehabiyên Pêxemberî, ebû Hûreyre rîwayet dike Resûlê Xwedê evha gotiye: “*Nod û neh navên Xwedê hene, ji sedî yek kêr, heke kesek vana bi lêv bike û pê bawer bike diçe bihuştê*”. Ji van ra Esmâu’l-Husna tê gotin. Esmâu’l-Husna, bi Erebi ye û tê wateya navên herî xweşik. Di Quranê de Xweda ewha ferman dike: “*ji bo Xwedê Esmâu’l-Husna hene. Nexwe bi wan navan ji Xwedê daxwazê bikin û ewên ku derbareyê navên Xwedê de ne rest in, wan bihêlin (ji Xwedê re); ewê bigêhin cezayê kar û kiryarên ku dikin.*”¹⁵

Wekî ku di ayêtê kerîme de jî derbas dibe çawa ku Xwedayê Tea’la emir dike ku bila di’ a bi navên wî bîn kirin; di helbestên klasîk de piraniya şair û helbestvanên kurdî navên xwedê gelek caran bi wateya wan re têkildar kirine û bikaranîne.

3.1.2. Xweda

Xweda, yekane hebûna mûtleq e ku kaînat afirandiye û bi rê ve dibe. Hebûna wî, ji xwe ye. Hemû kemal di wî de ne. Ew, navê Wacibu’ul-wucûdê ye ku sifet û kirinên wî, kemal in. Ji ber ku navê “Ellaah”, hemû kemalatan di xwe de dihewîne, jê re “Îsm-ê Camî” jî tê gotin.

¹⁴ Hayrullah Acar (2016), *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr*, Çapa 1ê, Weşanên Nûbihar, Stenbol, r. 97.

¹⁵ Sönmez, r. 56.

Ellah bi Erebî ye. Kurdiya wê Xweda û Xwedawend e.¹⁶ Qursincî di nav çend helbestan de vê navê bi kar aniye.

Bitirsin bilerizin ji **Xwedayê** mezin

Xafil qet kesek nemînin mêr û jin H: (1/18)

Şev û roj pir dikin sebrê,
Heta **Xwedê** rehmê bişine. H:(2/20)

Binêr ka çi hat ser me, îsal heyva sibatê.
Xwedê tu xirab bikey, mala fesadê vî welatê H:(10/1)

3.1.3. Navê “Rebb”

Rebb, ji lêkerea “re-be-be” yê hatiye dariştin û tê wateya efendî, xwedî, perwerdekar, berpirsîyar, rêvebir, nîmetdayende, serok, bijarte, xwedan otorîte û melîk e û pirjimariya wî jî “Erbab” e. Weke navê Xwedê tê maneya ewê ku mexluqên xwe bi qencyên xwe perwerde dike û wan roj bi roj mezin dike. ewê ku bendeyên xwe yên bawermend, bi ya ku dilê wan çaksaz dike, perwerde dike. Navê Xwedê yê Rebb, di Quranê de 969 caran derbaz dibe.¹⁷

Navekî Xwedê yê xweşik e. Di ferhengê de pêyva “Rebb” malîk, afirîner, xwedî, tişteke ku islah dike, terbiye dike, efendî wateyan dihewîne. Li gor Îbnul-Enbarî Rabb tê sê wateyan.

a. Malîkiyet; yanê hemû tiştên ku di bin teserrûfa wî, qudreta wî de ne û xwediyê hemû tiştan e ku, rêveber û îdare hemû di destên wî de ne. Tenê ew Rebb dikare bi îlma xwe û qudreta xwe dikare hemû tiştê bi rê ve bibe û îdare dike û teserrûf di destê wî de ye.

b. Navê Rebb, wateyên ew ê ku jê re îta’et bê kirin, efendiyê ku li hember wî stû bê tewandin dihewîne. Rebb bi pêyva ku di Qurana pîroz de derbas dibe; “Mewla” yê re hemwate ye. Dîsa ew Rebb, wateyên kesê ku jê re îte’at bê kirin û li gor emrê wî bê hereket kirin ji nehyê wî dûr bê ketin û efendiyê yegane ye.

c. Rebb; di wateyên islah kirin, terbiye kirin, safî kirin, gihandin dihewîne. Yanê ew Rebb, hemû tiştî rast dike, ji îfrad û tefrîdê mûnezzeh, bi ewayek kamil û tam tiştan rast dike, zedehî û kêmasiyan pêk tîne û terbiye dike. Wekê ku tê zanîn wateya pêyva Rebb’ê, kesê ku “terbiye dike” ye.¹⁸

¹⁶ Acar, r.97.

¹⁷ Sönmez, r. 58.

¹⁸ Alaadin Başar (2006), Rabb İsmi, [https://sorularlailamiyet.com/dualarda-ozellikle-rab-ismi], Dîroka Gihiştinê: 11.06.2019.

Fetwê nabînin qet mela, Cefa û zor, derd û bela
 Li ser canê wan bûn hela, **Ya Reb** ji wan re sebrê bişîne. H:(9/8)

Ebdullah, Arif, Meheme, Dilê wan bi keder û xem e
 Me'şûqa wan wek seltem e, **Ya Reb** muradê b'cî bîne. H:(/)

Havîn û payîz û bihar, **Ya Reb** rehmê bikî her car
 Xulamê pir zeîf û jar, Şubhê Memê pir xemgîn e. H:(9/13)

Wekê teyrê sîsyakê serme da hatine xare.
Ya Reb tu wan xelaskî ji destê gurê hare. H: (10/4)

3.2. Pêxember, Kesayet û Têgehên Dînî

Di helbesta klasîk de dikare bê gotin ku hema hema herî zêde muhebbet û sifetên derberayê kesayeta Cenabê Pêxemberî de hatiye vegotin. Digel vê zat û ewliyayên din wekê babet di vê rêzê de duyemîn dikare bê hesabandin.

3.2.1. Hz. Muhammed (s.a.w):

Hz. Muhammed, pêxemberê dînê Îslamê ye û pêxemberê herî dawî ye. Di sala 571ê mîladî de li bajarê Mekkeyê hatiye dinê. Berî hatina wî ya dinyayê, bavê wî Ebdullah emrê Xwedê bi cih tîne. Hz. Muhammed dem temenê wî dibe 6 salî dayika wî Amîne jî diçe ber rehma Xwedê û ew dimîne êtîm û sêwî. Kalikê wî Ebdulmuttalib, hetanî mirina xwe wî xweyî dike û piştî mirina wî, apê Hz. Pêxember, Ebu Tlib li wî xwedî derdikeve û wî mezin dike. Di 25 saliya xwe de bi Hz. Xetîce re dizewice û di 40 saliya xwe da jî bi wezîfeya pêxembertiyê tê wezîfedarkirin. Di sala 632an da li Medîneyê ruhê xwe teslîm dike û diçe cem Rebbu'l-alemîn.¹⁹

Di helbesta klasîk de gelek navên pêxemberê me derbas dibin. Yê herî zêde tîn bikaranîn Muhammed û Ehmed e. Wateya ehmed û Muhammed “ yê zêde hatiye medihkirin, pesnê wî hatiye dayîn” e. Taha/Ta-Ha û Yasîn/Ya-Sîn, ji herfên mûteşabîh pêk tînin, serpêyvê du sureyan e û hinek mûfessîr dibêjin ew navên pêxemberê me ne. Ew fexrê kaînatê ye û di

¹⁹ Sönmez, r. 62.

helbesta klasîk de bi van navan hatiye bîranîn û şa'iran di helbestên xwe de gelek medh û senayê wî kirine. Di helbesta klasîk de hema bêje her şa'ir der heqê wî de ne't nivîsîne. Jiyan û tekoşîna wî mijara gelek berhemên edebî bûye. Derheqê wî de agahiyên ku li ser her musulmanî ferz e, ji aliyê helbestvanan ve jî wek berhemên edebî hatine vegotin. Bi vî awayî cureya edebiyata dînî-tesewifi hatiye meydana. Li gor helbestên ku amaje bi cenabê pêxember hatiye kirin; ew hebûn û heybera ewil e, tecelliya bedewbûna kaînatê ye, hêja û xweşmêrê mirovahiyê ye, Încîl teşrîfa wî xeber daye, derketiye ser erşê, çerx û zemîn jê re secde kirine, ji wî mezintir şefa'etkar nîne, musulman bi ummetbûna wî serfiraz in, kes nikare ji bin vegotina wesfên wî rabe, ew serok û pêşewayê pêxembera ye, gelek mu'cize nîşan dane, ew Ebu'l-Qasim (Bavê Qasim) e, Resûlê Emîn e, bi zatê wî alem şeref girtiye, şeytan nikare têkeve şivê wî û hwd.²⁰

Qursincî di çend cihan de navê cenabê pêxember bi meded û bi diayên xwe re bi bîr aniye. Jixwe li gor hedîs û ravîyan, wextê ku diayek bê kirin divê navê cenabê pêxember jî bê gotin, şefaata wî ji bo musulmanan li bal Xweda, -di tabîrê de xeta nebi- wek referansa mezintirîn e.

Guh nedîn vî dinya bê wefa
Nema ew ji bo **Muhammed Mistefa.** H:(1/23)

Îmdada me ji **Muhammed** (S.a.v) bû ew şefî ummetê
Îmdada me ji **Muhammed** (S.a.v) bû ew babê fatimayê H:(12/6)

Em ditirsîn dilerizîn ji agirê nîran
Îmdada me ji Xwedê **û Pexemberê axir zeman.** H:(12/12)

Şaîrê ku ev gotî, kor e li ber pê xwe nabîne
Îmdada wî ji **Muhammed** (S.a.v) bû heta Xewsê nûrîn e. H:(12/17)

3.2.2. Yûsûf û Zûleyxa

Kurê Hz. Yakub e û Pêxemberekê ku ji Benî-Îsraîlîyan re hatiye şandin e. Koka pêyva Yûsûf bi Îbranî Yosef e. Di çavkaniyên Îslamî de ev nav wekê Yûsuf, Yûsef, Yûsif bi sê ewayan tê xwendin û jêdera wî bi nîqaş e. Ev peyv bi Erebi ji pêyva “Esef”ê ku wateya wê

²⁰ Acar, r. 103.

xemgîn e dariştiye, Yûsûf bi cudabûnê bavê xwe xemgîn kiriye û di wateya xemgîn de navê Yûsuf hatibe bikaranîn jî, fikra ku koka wî ji Erebiyê ye, nehatiye pejirandin. Li gorî Tewratê Yûsuf, kurê Îbrahîmê kurê, kurê Îshaqê, kurê Yaqub ku ji jinê wî piştî deh zarokên wî yê yazdemîn e û ji jina wî yê bi navê Rahel yekemîn zaroka wî ye. Rahel keça xalê Yaqub e. Li gorî Qurana pîroz dazdeh zarokên Yaqub hene, Bûnyamîn û Yûsûf birayê helal in. (Yûsuf 12/4, 59).

Jina Potîfar ku di hin çavkaniyan de navê wê Zûleika (zûleyxa) ye, bi evînî û xwestineke mezin ji Yûsufê pir çeleng û rind re pêşniyar dike ku bi hev re bin. Lê Yûsuf tişteke bi vî ewayê li hember jina efendiyê xwe yê ku mal û milkê xwe emanetê wî kiribû wekê îxanet dîtiye. Ji bilî vê, li hember Xwedayê xwe nexwestiye gunehkar bibe û vê teklîfa Zûleyxa qebûl nekiriye. Her çiqas Zûleyxa israr kiribe jî Yûsuf dîsan qebûl nekiriye.

Di tefsîran de, di pertûkên dîrokî de, di qîssetên enbîyan de, di mesnevîyên Yûsuf û Zûleyxa de derheqê Hz. Yûsuf de agahiyên pir dirêj hene. Rindbûn û bedewiya wî bûye wekê darbimesel.

Bi kurtasî piştî hewldanên gelek dûr û dirêj bi destûr û înayeta Xwedê Zûleyxa digihije armanca xwe û di navbera herdûyan de bi îzna Xwedê evînî û zewacek pêk tê. Zor û zehmetiya ku Zûleyxa di vê riyê de kişandiye; sebir û metaneta ku Hz. Yûsuf nîşan dayê, ji bo pirtûk, mesnewî nivîskar, Şairên Îslamî û ji xeyrî îslamî re bûye mijar ku ji cîheta wêjeyê ve jî tekildar bûye.²¹

Di edebiyata klasîk de, ji ew pêxemberên ku navên wan herî zêde derbaz dibe, yek Yûsuf Pêxember e. Ji ber ku bedewiya wî bi nav û deng bûye, helbestvan piranî evîndar şibandine wî. Heta mirov dikarê bêje, evîndar wekê Yûsufê duyemîn dane nîşandan. Bi sedema ku roj û hîv jê re çûne secdeyê, avêtina wî ya bîrê, di dema firotina wî de xistina wî ya mêzînê û bi qasî giraniya wî dane zêran, serpêhatiya wî ya bi Zûleyxa ra, avêtina wî ya zindanê, pisporbûna wî ya derbirînkirina xewnan, dûrketina wî ya ji bavê wî Yaqub Pêxemberî, piştî koletiyê bûyina wî ya wezîrê Misrê û... hwd bûye mijara gelek helbest û beytan.²²

Çûme Hîzan bi qezayê , Serê min ketya belayê

Wekê Yûsuf Zûleyxayê, Kes îmdadê Şebab nayê

H:(3/1)

²¹ Hanife Koncu (2013), "Yûsuf ve Zûleyhâ", *Dîyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 44, r. 38.

²² Sönmez, r. 68.

3.2.3. Ebdulqadîr Geylanî (Xewsê Nûrîn)

Di sala 1077'ê de li rojavayê bakur ê behra Xezêrê, li şehrê Gilanê di gundê Neyfê hatiye dinê. Di derheqê bavê wî Ebû Salîh Mûsa de zêde agahî tinebe jî merîvekî oldar tê zanîn. Di çavkaniyan de şecereya wî diçihije Hz. Elî. Di temenêke biçûk de bavê wî wefat kiriye û Ebdulqadîr li cem diya di hîmayeya kalkê xwe Savmaî de mezin bûye. Di deh saliya xwe de wextê diçe dibistanê pê bawer bûye ku di bin parastina ferîşteyan de bûye. Armanca wî ya herî mezin, navenda tehsîl û ilmê ya wê serdemê li Bexdayê ders dîtin bûye.

Di hejdeh saliya xwe de ji diya xwe destûr girtiye û beşdarî qafilayek bûye, çûye bexdayê. Li wir ji gelek alimên wê qonaxê dersên hedîs, fiqih û edebiyatê girtiye. Di demek kurt de di warê mezheb û ûsûlê de xwedî gelek agahî bûye. Bi mûtesewifên Bexdayê re dostaniyên xurt daniye û di van salan de întisabê tesewufê kiriye. Piştî vê bi qasî 25 salan di înzîvayê de maye û hetanî kesekî tiştêk bi wî nedaye xwarin bixwe tiştêk nexwariye.

Bi îhtîmalekê di dawiya înzîvayê bi kurê xwe re çûye hecê. Piraniya sûfiyê ku li mekkeyê nas kiriye re xirqeyê daye wergirtin. Sa'dî di beşa duyem ê Gûlîstanê de wî dîtiye ku bi libasa kabê ve vezeliqiye dûa kiriye û qala Geylanî kiribe jî, ji hêla dîrokê ve dîtina wî ne mumkûn e. Sûhreverdî dibêje ew bi çar jinan re zewiciye lê çî wextê zewiciye nayê zanîn. Bi îhtîmake wextê ku ketiye xelwetê zewicandî û xwedî zarok bûye. Dîsan li Bexdayê wefat kiriye.²³ Mûtesewif û zanayê navdar êx Ebdulqadirê Geylanî damezrînerê terîqata Qadiriyyê ye.

Abdulqadîr Geylanî ji bilî vê navê di nav gel û hezkriyên wî yên di şopa wî de wekê Xewsê Azam û Xewsê Nûrîn, Qûtbê Rebbanî, Siltanê Ewliya û Bazê Eşheb hin ji leqebên wî ne.²⁴ Qursincî di berhema xwe de Abdulqadîr Geylanî bi navê Xewsê Nûrîn bi kar aniye.

Şairê ku ev gotî, kor e li ber pê xwe nabîne

Îmdada wî ji Muhemmed(S.a.v) bû heta **Xewsê Nûrîn** e.

H:(12/17)

3.2.4. Hekîmê Loqman

Luqman Pêxember, di kevneşopiya gel de weke kesayetekî dîrokî ye û di rewşên curbecur da derdikeve pêşiya me. Li ser navê wî di Quranê de sureyeke serbixwe heye û navê Sûreya Luqman e û di rêza 31an da cih digre. Di derheqê wî de Xwedê ewha emr û fermanê

²³ Süleyman Uludağ (1988), “ Abdulkadir Geylani”, *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 1, r. 234

²⁴ Acar, r. 112.

dike: “ Sond be bi rastî me hikmet da Loqmanî; ku şikra Xwedayê xwe bike. Çi kesê şikra Xwedê bike, ew ji bo xwe dike. kî jî nakokiyê bike bila bizane ku bêguman Xwedê dewlemend e, hêjayî pesindayinê ye”.²⁵

Derbarê pêxembertî an welîbûna wî de rîwayetên ji hev cuda hene. Lê bêtir wek bendeyek salih tê qebûlkin. Di Qur’anê de sûryek bi navê “Loqman” heye. Xwedayê mezin navê wî, di Qur’anê de bi vî şiklî zikir dike: “Bi rastî ji bo ku Şikra Xwedê bike me ‘ilm û feraset daye Loqman.” (Loqman, 12) Di nav gel de jî wek pîrê hîkmet û hekimtiyê tê naskirin.²⁶

Di sedsala 18an de Mela Mihemed Qutib an jî bi navê xwe yê meşhûr Melayê Erwasî, li ser nexweşî û dermanên wan, bi Kurmancî pirtûkek li ser bijîşkiya gelêrî nivîsîye. Ev pirtûk bi piranî li ser bingeha tîba Calînûs hatiye nivîsîn. Di vê pirtûkê de navên gelek nexweşiyên û dermanên wan, derbareyê tendûristiya mirovan de baweriyên wê demê û şîretên cur bi cur hene.

Seddîq Sefizade Borekayî jî li ser bijîşkiya gelêrî ya ku di nav Kurdên Îranê de tîna zanîn, pirtûkek nivîsîye. Ev pirtûk 200 rûpel e û bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn.²⁷

Serê dilê min kul bû ax cîgera min birîn e

Calînûsê hekîmê **Loqman** rabe derman tunîne

H:(12/13)

3.2.5. Qiyamet

Qiyamet, peyveke Erebi ye û ji lêkera “qe-we-me” yê hatiye dariştin, wateya wî tîkbûn, rabûna li ser lîngan, sekinandin û roja ku her zindî tîda li hizûra Xwedê disekinîn e. Weke tîgeheke dînî tê wateya ku dema ku Xwedê ji eze va teqdîr kiriye, mirina bi tevahî zindiyên ku di dinyayê de dijîn û paşê jî ji aliyê Xwedê va vejîndina bi tevahî kesên ku mirine, kombûna wan li cihê mahşerê, di derheqê wan de lêpîrsînkirin û dayina beraberiya karê ku wan li dinyaê kirine. Roja mehşerê jî di heman wateyê de ye.²⁸

Pîştî guherîna pergala kozmîk a ku dinya pêve girêdayî ye, jiyana ebedî ya ku bi vejîna mirîyan destpê dike ye. û Pêyva Qiyametê tê wateya “Rabûn û ser piyan sekinîn e”. Di wateya Qiyametê de navdar an jî masdar e ku “Vejîn û ji gorê derketin e”. Li hember hizûra

²⁵ Sönmez, r. 70.

²⁶ Acar, r. 349.

²⁷ Kadri Yıldırım (2013), *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Weşanên Enstîtûya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Mardîn Artuklûyê, Stenbol, r. 142.

²⁸ Sönmez, r. 79.

Xwedê sekinîn e, an jî destpêka pêkanîna vê bûyera kozmîk e. Di Qurana pîroz de, nêzikî wateya qiyametê pêyva axîretê di 110 cihan de derbas dibe. Li gor baweriya Îslamiyetê, baweriya qiyametê û ya axîretê baweriyên bingehîn in ku mijara axîret û qiyametê di sedan ayet û sureyan de bi şeweyên cur bi cur û di hin sureyan de bi awayekî xûsûsî û xweser hatiye vegotin. Di van ayetan de bêguman jiyana civakê û berpirsiyariyên mirovahiyê dixwaze bê vegotin. Ango “Bila herkes ji bo sibetirê çi amade kiriye, bila xwedî vê hişmendiye bibin” (el-Haşr 59/18). Di Ayetê Kerîme de armanc ew ku, dixwaze bi fikra pêşerojê û ji bo dilşahiya jiyana ebedî, mirovahiyê hişyar bike.²⁹

Zilm zor e dinyayê de pir ar e

Qiyametê cezayê zilmê nar e

H:(1/21)

3.2.6. Sûnd

Di ferhengê de pêyva sûnd wateyên “Destê rastê, aliyê rastê, rast, peyman, hêz, bereket” dihewîne û sûnd dîsa tê wateya saxlembûna qerara yekî û bi armanca îqnakirina kesekî soz dayîn û beyana xwe bi navê Xwedê saxlemkirin e. Peyva sûndê di zimanê Erebi de bi îfadeya Qesemê jî tê bikaranîn. Qesem dîsa ji ber ku têgehek îslamî ye, li gor baweriya îslamê sê heb qesem hene. Ev hersê jî “Wellahî, Bîllahî, Tellahî” ye.³⁰ Di Kurdî de jî bi piranî bi şeweya “Her sê Qesem” ji hêla gel ve tê bikaranîn.

Hunera wî wek hunera pehlewan e

Sûndê dixwe **Wellah** qîsse dibêjê carek

Ezê lê bidim bi destê xwe yên mubarek.

H:(5/8)

3.2.7. Hûrî

Hûrî qîzên, cennetê ne. Sipîka çavê wan ji reşîka wan zêdetir e û çavxezal e. Li gorî Qurana Pîroz hûrî, dê di cennetê de ji mû'mînan re xizmet bikin. (Alî 'Imran/15, Beqere/25, Nîsa/57) Hatiye riwayetkirin ku hûrî ji sefran, misk, enber û kafûrê hatine çêkirin.³¹

²⁹ Bekir Topaloğlu (2002), “Kiyamet”, *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, Ankara, c. 25, r. 516.

³⁰ Ertuğrul Boynukalın (2013), “Yemin”, *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 43, r. 417.

³¹ İskender Pala (2012), “*Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*”, Çapa 22, İstanbul, Weşanên Kapı, r. 212.

Hatiye riwayetkirin ku gulpikê horiyan weke gulan in, didanê wan weke durran in, lêvên wan wekê mercanan in, bejna wan weke dara selwiyê ne, xûy û xisleta wan baş e û ew, xweşikîrîn qîzên ji gulan in. Ji ber ev taybetiyên xweşik, di edebiyatê de yar bi horiyê hatiye şibandin. Ew ku hiş û aqilê evîndarê ji serê wî derxistiye, horiyek ji horiyan e û cihê yara wî jî cennet e.³²

Hatin qîzê van Xertiyan, Van dildar û van **periyân**

Van esmeran wek **hûriyan**, Wekê wan min kes nedîne.

H:(9/4)

3.2.8. Perî

Ji taîfeyên ecinniyên mê re tê gotin, ji ber ku kes vana nedîtiye pir sipehî û cazîbedar tên bawerkirin.³³

Di Farisî de koka pêyva periyê di beşên Zend-Avesta de derbas dibin û “paîrika” ye, wateya wê “kesê ku sêhr dîke û qîza ku bi bedewiya xwe efsûn dîke” ye. Di zimanê Pehlewî de parîk/parîg û şûnde perî bûye. Di Zend-Avestayê de derbareyê Paîrikayê de mexlûqek ku hatiye qewirandin û hatiye ser av, ax, agir, dar û li ser erdê wekê îblîs û şerr hatiye behs kirin. Di efsanêyên qedîm ê Îranî de paîrika, wekê qîzek bedew ê şeytanî hatiye teswîrkirin. Bi derbasbûna gelek zeman re cîheta paîrika yê xirab wenda bûye û bi hûrî re mûsemma bûye û bûye temsîla bedewiyê. Çîrokên periyân, meseleyên derheqê wan de û teswîrra wan hema hema di hemû cûreyên wêjeyê de derbas dibin. Di wêjeya Faris, Ereb, Tirk û wêjeyên Ewropî de jî cihêk berfireh girtiye û keresteyekê girîng bûye.³⁴

Hatin qîzê van Xertiyan, Van dildar û van **periyân**

Van esmeran wek hûriyan, Wekê wan min kes nedîne.

H:(9/4)

Em derketine serê banî, **Perî** hatin, ketne xanî

Rewneqê dabû eywanê, Aşiqê wan pîr dîn bûne.

H:(9/10)

³² Sönmez, r. 81.

³³ Pala, r. 369.

³⁴ Nebi Bozkurt (2007), “Perî”, *Dîyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 34, r. 232.

3.2.9. Mewt (Mîrin)

Mewt Erebi ye û ji lêkera “ma-te”yê hatiye dariştin û wateya eê mirin û tunebûn e û kurdiya wî jî mirin e. Mirin di tesewufê de tê wateya ku derwêş nefsa xwe ji daxwa û hewesên dinyayê paqij bike. Ji vê yekê re tê gotin ku mirina îxtiyarî; aynê mirina dilxwazî. Di teswufê de pileya yekem kuştina nefsê û di şûna mewtê de memmat jî tê bikaranîn.³⁵

Kurdiya mewtê, mirin e. Di tesewufê de mirin dûrketina derwêş ê ji hewa û hewesên dûnyewî ye. Ji vê re “mirina îxtiyarî” tê gotin. Di tesewufê de asta yekem ew e ku derwêş nefsa xwe bikuje.³⁶

Lewra di hedîsekê de weha hatiye gotin: “Mûtû qeble ente mût” beriya mirinê bimirin. Ji bedela mewtê memmat jî tê bikaranîn.³⁷

Zozanê me xweş bûn hewa serin e.

Ax û sed ax û sona wî **mirin** e.

H:(1/16)

Sed sal tu ‘emir kî bimînî dinê.

Rojek dê bibînî zewqa **mirinê**.

H:(1/22)

3.2.10. Fetwa

Fetwa ji hêla dînî û hiqûqî ve bersivdayîna meseleyeke fiqhî ye, pêyva fetwayê ji pêyva “Feta”yê hatiye zêdekrin û wateyên “mêrxas, egî, lehenh” dihewîne. Di ferhengê de “Di derbareyê meseleyekê de ravekirin û bersiva hikma wê meseleyê dayîn, bersiva çareserkirina zehmetiyan e”.

Di Qurana Pîroz de pêyva fetwayê û yên mîna wê, di nav ayetan de derbas dibin û di hemûyan de ji nêzikî wateya ferhengî; derbareyê bûyer û meseleyekê de agahî xwestin, nêrîn pirsîn û pêşniyaza nêrînan e ku (en-Nîsa 4/127, 176; el-Kehf 18/22, 149) şîroveya xewnan (Yûsuf 12/41, 43, 46) û wateyên mîna wan dihewîne. Herwekêdin di 15 ayetan de “Yes’elûneke” “Ji te dipirsin” cih digire û bi piranî “Ji te derheqê vê meseleyê de hikma dînî çî ye, dipirsin” van wateyan jî di nav xwe de dihewîne.³⁸

³⁵ Sönmez, r. 78.

³⁶ Pala, r. 314.

³⁷ Acar, r. 125.

³⁸ Fahrettin Atar (1995), “Fetva”, *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 12, r. 486.

Fetwê nabînin qet mela, Cefa û zor, derd û bela

Li ser canê wan bûn hela, Ya Reb ji wan re sebrê bişîne.

H:(9/8)

Sûret sipî çavê reş bûn, Bi biskên reş, bêhnxweş bûn

Lewra xulam pir nexweş bûn, Tu mela **fetwê** nabîne.

H:(9/7)

3.2.11. Bext, Talih

Bernameya jiyane ye ku bi îredaya Îlahî hatiye diyarkirin “bê şik û bê şubhe Xwedê çi bixweze dike, bi her ewayê îradeya xwe bi rê ve dibe” (bnr. Âl-î Îmran 3/40; el-Maîde 5/1). Ji aliyekî din ve arzû û xwestinên beşerê yê bê hed û pir in, ji aliyekî din ve jî tê zanîn ne mimkun e ku ev qas xwestin û arzûyên beşerê pêk wer. Ji ber vê yekê mirov ew kar û xwestinên xwe ye ku fîlen nikarin pêk bînin, girêdayê vê bernameya îradeya Îlahî dikin.

Li gorî fikra bê tercihkirin bext ji Farisî jî derbasî Erebi bûye û herçiqas wateya “bûyerên baş û xirab e girêdayî bernameya îradeya îlahî ku girêdayî însên nîne” bihewîne jî, ji bo bûyerên baş û dilşahiye jî tê bikaranîn.

Di heman wateyê de ev pêyv bi Erebi “Tali” tê nivîsîn. Pêyva “tali” tê wateya “bilindbûn, derketina holê”, wextê ku ev pêyv ji bo tav û hîvê bê bikaranîn “ derketina tavê û tecellîbûn” e. Kesên ku bi Astrolojiyê re têkildar in, li gor derketina hin stêrkan, texmîn kirine ku dê hin bûyer biqewimin û ji vê ra tali’ hatiye gotin. Li gorî vê talih “bernameya hin bûyerên ku ji derê qudret û îradeya insan in, di pêşerojê de pêkhatina wan in”. Ango, “ji cîhetên baş û qenc ve pêkhatina qederê ye”. Bi piranî pêyvên qismet û nesîb jî dîsa nêzikî wateya pêyva talihê tê bikaranîn.³⁹

Derketin em ji nav gundiyan , Çûne Awa, dev geliyan

Cenaze hebû ser çiyay, **Tali’** û **bextê** me nîne.

H:(11/3)

Muşerref ji gulay pir geştir, **Bextê** wî ji **tali’ê** reştir

Orek ji Mavekan nexweştir, Kes haja **qederê** nîne

H: (11/110)

³⁹ Bekir Topaloğlu (1991), “Baht”, *Diyaret İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 4, r. 521

3.2.12. Zebanî

Zebanî navê ferîşteyên ku mirovan sewkê cehennemê dikin û rêveberiya wê derê dikin e. Di ferhengê de wateya “bi zordariyê kaşkirin, dehf dayin” e û ji koka **zebnê** bûye zebanî û pirjimariya vê pêyvê **zebâniye** ye. Ji ber ku bi şiddetê muameleya kesên ketine cehennemê dikin û dîsa ji ber ku hem destên xwe hem jî piyên xwe bikar tînin vê navê girtiye.

Zebaniye di Qurana Pîroz de li cihekê derbas dibe û bi vê navê qesta ferîşteyên ezabê tê kirin. (el-Alak 96/18). Li gor ku di sureya Alakê de tê diyarkirin Xwedê, ew kesên ku nehêlin Resûlê Ekrem nimêj bike û ji vê xirabiya xwe poşmam nebin dê ji eniya wan ê gunehkar û derewker bigire û bavêje cehennemê û heke ev kes ji bo alikariyê gazî hevalbendên xwe bike dê Xwedê jî gazî zebaniyan bike (96/9-18). Di çavkaniyan de tê diyarkirin, ev kesa ku nahêle Resûlê Ekrem nimêj bike Ebû Cehîl e.

Di Qurana Pîroz de li gorî raveyên derbareyê Cehennemîyan de tê fêmkirin ku li ser serê zebaniyan ferîşteyekê bi navê Malik heye. Wextê ku ehlê cehenemê bixwazin ji ezabê xelas bibin, xîtabê vê ferîşteyê dikin û dibêjin “lava dikim, bila Xwedê dawiya heyata me bîne!”, ew jî bi îfadeya “Na! Dê hûn herdem li vir bimînin” bersiv bide (ez-Zuhuf 43/77).⁴⁰

Zilm û zorî nekin li kesê gundiyan

Belkê hûn xilas bin ji **zebaniyan**.

H:(1/20)

3.2.13. Qebr

Di Erebi de bi piranî tê wateya “cihê ku mirî tînin definkirin”, herweha di wateya cihê goristanan de jî tê bikaranîn. Bi Erebi makber an makbere jî tê gotin. Di dînen beriya Îslamê de piştî mirinê bedenên insan li gor erdnîgarî û serdemê cur bi cur hatine definkirin. Di destpêka mirovahiyê de çî hatiye li bedenên însên zêde nayê zanîn û agahî kê in. Muameleya qebrê, ji bo tenduristiyê, ji ber tirsê tiştên ku nayên zanîn, ji ber dûrketina bedena mirî an ji bo hestên parastina cesedê û ji ber sedemên cur bi cur dibe. Li ser fikra mirinê bi paralela guherînan dîrokî her dîn jî hêla mîmarî ve û ji hêla bawerîyan ve wateyên cuda dane qebrê.

Di tesewufê de qebr destpêka pêvajoya berzehê ye û berzeh, di navbera alema şehadet û alema xeybê de wekê pirekê tê dîtin.⁴¹

⁴⁰ Yusuf Şevki Yavuz (2013), “Zebani”, *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 44, r. 164.

⁴¹ Kürşat Demirci (2001), “Kabir”, *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 24, r. 33.

Ji êvarê heya sibehê tu tariyê da bimîne
Temsîla eqlê bide **qebra** tarî bi bîr bîne.

H: (12/13)

Ji hêla terîqet û tesewûfê qebr; tê wateya ji bo terbiyeya nefsê, dilnizmiyê û ji alema maddî dûrketinê ye. Qursincî jî li vir di heman wateyê de di tariyê de mayîn an temsîla qebrê bi bîr tîne û nefsa ku xwe layemût (nemir) dizane, dixwaze terbiye bike.

3.3. UNSURÊN XWEŞİKBÛNÊ YÊN EVÎNDAR

Derbareyê evînê de û teşbîhên ji bo yarê hatiye kirin gelek in. Her wiha, her yekî ji wan sifetên ji bo yarê hatiye bikaranîn wateyekê xwe ya cuda heye.

3.3.1. Por (zulf, bisk)

Di edebiyata klasik de ji bo xweşikbûnê unsûra herî serke ku tê bikaranîn porê evîndarê ye. Ev porê ku carinan belawela, honadî, badayî, bi pêç û fetl, şehkirî ye, dilê rebenê ‘aşiq bi rengê xweyî reş û bi bêhna xwe yî muşkinê xweş li dû xwe dikêşe û heşê wî ji serê wî dibe.⁴²

Sibê rabûn meşyan banê, Bayê dida takê rihanê

Zulf hatin ji terefê rû, Nema cihê ramûsanê

H:(11/9)

Binêre tu l’bejn û balan, Hem qamet û **zulf** û xalan

Nazik û qenc û delalan, Şubhê Ferhad û Şirîn e.

H:(9/11)

Sûret sipî çavê reş bûn, Bi **biskên** reş, bêhn-xweş bûn

Lewra xulam pir nexweş bûn, Tu mela fetwê nabîne.

H:(9/7)

3.3.2. Çav (Çeşm)

Çav di edebiyata Kurdî ya klasîk de der barê bedewiyê de unsûrek sereke ye. Hemû taybetmendiyên evîndar di xwe de nîşan dide. Zalimbûn, laqeydî, nazî û tinazî tev ji çavên

⁴² Acar, r. 196.

evîndarê diyar dibe. Bandora çavan li ser aşiq pir zêde ye. Evîndar bi çavên watedar gelek tiştan îhsas dike. Ev nêrîn carinan bi awirên tûj mîna tîrê, dilê evîndar qul dike. Di vê tîrbaranê de brûyên mîna kevanan, mujangên mîna tîrên qeceran jî roleke girîng dilîzin. Çav bi gelek tiştan tê şibandin. Cadû, sahir, mest, mexmûr, xwînxwar, qatil, xwînrêj, zalim, bêdîn, rêbirr, talanker, şerxwaz, fettan, nergis, badam (behîv), xezal û hwd. hin ji teşbîhên çavê ne.⁴³

Rabûn em çûne Mavekan, Digel yar û **çavbelakan**

Qet nayê dengê tifengan, Şîn e li we, şahî nîn

H: (11/10)

Jinkek hebû li Oreke, Hemla xwe danî keçekê

Wefat kir **çavbelekê**, Kes haja dawetê nîne

H:(11/13)

Sûret sipî **çavê reş** bûn, Bi biskên reş, bêhnxeş bûn

Lewra xulam pir nexweş bûn, Tu mela fetwê nabîne.

H:(9/7)

Bi zewq û ken û kêyfa **çavbelakan**

Ji bêhna gul û rihan û çiçekan

H: (1/12)

Di nav gel de bêjeya çavbelekê li gelek herêman bi piranî tê bikaranîn. Bêjeya çavbelekê dîsa sifeteke aşiqê yê ku resen Kurdî ye. Wekê pênase meriv dikane ji bo çavbelekê raveyek weha bike ku tiştê belek, him xalên reş û him jî xalên sipî li cem hevdu bin wekê renekê nû dibe belek.

3.3.3. Rû (Sîma)

Rû û muteradifên wê yên wek sîma, dîdar, rux, wech di edebiyata kalsîk de bi giştî tecellîgeha Xwedê Te'ala ye. Bedewî û xweşîkbûna me'şûqê herî zêde di rûyê wî de ye. Lewra rû mesken û xwediyê xweşîkahiyên mîna çav, brû, dêm û levan e. Ji ber vê yekê rû, cî war û bendera bedewiyê ye. Carinan bi riya mecaza murselê ji bedêla rû, dê jî tê bikaranîn û ji vê re bi giştî cemal tê gotin. Ev spehitî û delalî rengvedana xweşîkbûna îlahî ye. Ji ber vê yekê wateya wê ya tesewifî tê bikaranîn. Rengê rû bêtir sorgewez e. Ev reng jî rengê şerm fedîkariyê ye. Rû geş û birqandî ye. Meh-rûbûna yarê ji vê pêk tê. Tava hêyvê nûr e. Ji ber vê

⁴³ Acar, r. 198.

jî rûyê yarê nûranî û ronî ye. Ji ber van gişan aşiq ji temaşaya rûyê me'şûq qet têr nabe. Evîndar rûyê xwe car caran nîşan dide. Aşiq ji bo vê kêlikê dikare hemû can û ruhê xwe feda bike. Rû roj e, ronahî sibehê ye; rûyê yarê ji rojê dilkêştir e ji bo aşiq. Rûyê yarê geş, pak û paqij e. Aşiq bi bîranîana rûyê yarê hêstiran dibarîne.⁴⁴

Sibê rabûn meşyan banê, Bayê dida takê rihanê
Zulf hatin ji terefê **rû**, Nema cihê **ramûsanê**

H:(11/9)

3.3.4. Xal û Xet

Şan, şane, şanîk. Noqteyên reş ku bedena mirov de cih digirin. Di edebiyatê de behsa xalên reş û hûrik ku di rû de tîn dîtin zêde ye. Ev xalana bêtir bi dem, por, birû û lêvan ve tîn vegotin. Xalên hurik ên mîna nîskê û bi bêhna xweş wek misk û 'enberê hiş û 'eqlê aşiqan ji seran dibin, wan mest dikin. Xet tê wateya mû, pirç, pirtika li ser rehik û mêweyan. Mûyên zerik û zirav ên di rûyên kurên xort û keçên xame de derdikevin. Di helbesta klasîk de digel dem, lêv, xal, por û çeneyê bi hev re tê bikaranîn. Ji ber ku xet tê wateya nivîsê jî, li ser rûpela dêmê bi nivîsê jî tê şibandin. Xet bêhn-'enber e, dilkeş e. Rû û dêm mushef (kitêb) be xet ayet û sureyên ku tê de hatine nivîsîn e.⁴⁵

Binêre tu l'bejn û balan, Hem qamet û zulf û **xalan**
Nazik û qenc û delalan, Şubhê Ferhad û Şirîn e.

H:(9/11)

3.3.5. Gerdenzer, Zerî

Ji bo me'şuqan teswîra bedewbûna gerdana yarê ye ku ev şîbandin bi îhtîmalek mezin ji me'dena bi qîmet ji zêrê tê. Zêr û zîv di bazirganiyê de me'denên herî bi qîmet in. Wesîleya dewlemendiyê ye.⁴⁶ Zerbûn û qiymeta zêrê vê teşbîhê ji bo yarê derxistiye holê. Berî di gerdana qîz û bûkan de zêr hebûn. Wextê ku qîz û bûk vê zêrê dixistin gerdana xwe ev teşbîh û teswîr dihate kirin. Gerden, qismê bedena însên ya ku di navera çene û singê de ye.⁴⁷

Dest û tiliyên wan bi hena, **Gerdenzer** in wekê şema
Lev aşiqan hal tê nema, Lome l'aşiqan qet nîne

H:(9/12)

⁴⁴ Acar, r. 116.

⁴⁵ Acar, r. 202.

⁴⁶ Acar, r. 175.

⁴⁷ D. Îzolî, *Ferheng Kurdî- Tirkî Türkçe- Kürtçe*, Weşanên Deng, Amed, 2011, r. 220.

Binêre l'keyf û zewqa van **zerîyan**

Xilas bûne j'enwaê kêç û pûşîyan

H: (1/10)

Şema jî dîsan tişteker zer û nerm e, mêşên hingivê berî hingivçêkirinê vê derdixînin meydanê paşê hingivê xwe di nav van qulikên bi navê şema de çêdikin. Qursincî li vir du car teşbîh kiriye; him li ser gerdenzerê teşbîhek kiriye û dîsa gerdenzerê şibandiye şema yê. Şema, ji bo mêşên hingivê pêngavek herî muhîm ê çêkirina hingivê ye bingeha vê mucîzeyê ye.

3.3.6. Nazik, Qenc, Delal

Nazik, nazdar, qenc û delal sifetên herî navdar ê ji bo evîne tînan bikaranîn e. Di nav gel de herî zêde ev tînan bikaranîn. Di edebiyata klasîk de û di stranên Kurdî de meriv pirî caran rastî van hevalnavan tî.

Binêre tu l'bejn û balan, Hem qamet û zulf û xalan

Nazik û qenc û delalan, Şubhê Ferhad û Şîrîn e.

H:(9/11)

3.3.7. Qamet (bejn û bal)

Bejna yarê her dem rast û dirêj e. Ji bo vî sifetên mîna rast, bilind, mewzûn, (li hev hatî) tînan bikaranîn. Bejna yarê mîna herfê elifê, mîna dara selwê, 'er'êrê, çinarê, senewberê, şimşadê, tûbayê rast û bilin û lihevhatî ye. Lê belê bejna 'aşiqê reben ne wisa ye. 'Aşiq ji derdê yara xwe bûye du qet, dişibe herfa "dal"ê. Piştî wî ji ber giraniya evîna wî mîna çengê xwar bûye.⁴⁸

Binêre tu l'bejn û balan, Hem qamet û zulf û xalan

Nazik û qenc û delalan, Şubhê Ferhad û Şîrîn e.

H:(9/11)

⁴⁸ Acar, r. 203.

3.4. Çîrokên Evînî yên ku di Metnê de Derbas Dibin

Di helbesta klasîk de gelek caran meşûqên dilbirîn xwe dişibînin evîndarên navdar. Kul û kedara van evîndarên navdar ya di riya evînê de kişandine dibe mînak ji bo nivîskarê.

3.4.1. Ferhad û Şîrîn

Destana Ferhad û Şîrînê destanek ji destanên berî Îslamî ya îranî ye û Ferhad û Şîrîn jî du lehengên vê destana evindariyê ya bi nav û deng in. Şîrîn navê xanima perwîzî ye û dilê Ferhadî dikevê, li gorî efsaneyek din jî Şîrîn keçeke Ermenî ye û xenga xatûna Ermenîstanê Mehîn Banûyê ye.⁴⁹

Ferhad û Şîrîn, ji helbesta Nîzam-i Gencev ya bi navê Xûsrew û Şîrîn derketiye û şûnde jî bi ewayek xweser bûye mijar û keresteya mesnewiya klasîk. Di rola sereke de Şîrîn û dildarê wê Xûsrew û reqîbê Xûsrew Ferhad heye. Kesên ku vê çîroka evînî honandine bi navê “Ferhad û Şîrîn” an wekê “Ferhadname” nivîsandine, kesê sêyem Xûsrew paşda maye û zêde li ser nesekînê û di navenda çîrokê de zêdetir Ferhad heye. Di Nîzamî de û di berhemên muellîfên ku li pey şopa wî de meşiyane de Ferhad, wekê şexsê sêyem şûnde daxilî vê çîrokê dibe. Lê di mesnewiyên din de maceraya Ferhad ji serî destpê dike.

Ev mijar wekî xweser cara yekem ji hêla Elî Şîr Newaî ve hatiye nivîsandin.(1484) Elî Şîr Newaî vê çîrokê ji berhema nîzamî ya bi navê Xûsrew û Şîrîn cihêtir bi naverokek din vejandiye. Di taxa wêjeya Azeriyan de Nâkâm (m. 1906) jî Ferhad û Şîrînê û dîsa helbestvanek bi navê Omer Baki jî berhemek bi navê Ferhadname nivîsandiye.⁵⁰

Di edebiyatê de ev çîroka hanê him ji bomesneyên serbixwe himji ji bo hinek malikan bûye mijar. Bi piranî bi qulkirina çiyayî bûye mijara edebiyatê û ji ber ku pêyva “Şîrîn”ê bi wateya xwe jî şîrîn û xweşik e, bi riya hunera tewriyeyê jî hatiye hildan. Ji tiştên herî balkêş yên di vî çîrokê da derbaz dibin, dibin sedema bikaranîna hunera tewriyeyê. Xusrew, bi wateya xwe ya padîşahî û hukimdartiyê nîşana yarê û qudretê ye; Şîrîn jî bi wateya xwe ya şîrîn û xweşik, nîşaneya dev û lêvên yarê û bi xweşxebardana xwe jî hinek caran tê wateya hêstirên çavên evîndarî.⁵¹

⁴⁹ Sönmez, r. 128.

⁵⁰ Nurettin Albayrak (1995), “Ferhad ve Şîrîn”, *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, İstanbul, c. 12, r. 388.

⁵¹ Sönmez, r. 128.

Ev çîrok di nav mijarên edebiyata mesnewiya rojhilatê de cihekî girîng digre. Di edebiyata Farisî de Fîrdewsî di Şehnameya xwe de behsa vê çîrokê dike. Lê belê belavbûna vê çîrokê ji edebiyata Farisî bi edebiyata milletên din yê rojhilatê bi saya Nîzamiyê Gencewî çêbûye. Berhema Nîzamî ji bo helbestvanên pey xwe re bûye model û yên ku ev çîrok ji nû ve nivîsandine bi giştî di bin bandora wî de mane. Ev çîrok hem di edebiyata Farisî hem jî di edebiyata Tirkî de ji aliyê dehan helbestvanan ve hatiye nivîsandin.

Di edebiyata Kurdî de jî cara ewil ji aliyê helbestvanê kurd ê goran Xanay Qubadî (1704?-1778?) ve bi Kurdiya Goranî hatiye nivîsandin. Qubadî di serdema Nadîr Şah de jiyaye. Dema meriv bala xwe dide vê çîrokê evîneke sêgane derdikeve pêşberî me. Lehengên vê çîrokê yên eslî Xusrew û Şîrîn e. Ferhad jî aşîqê Şîrîn dibe lê Xusrew bi fendbaziyeke dike ku Ferhad xwe ji ber evîna Şîrînê bikuje. Di encamê de Şîrîn jî qesta canê xwe dike û xwe dikuje.⁵²

Binêre tu l'bejn û balan, Hem qamet û zulf û xalan
Nazik û qenc û delalan, Şubhê **Ferhad û Şîrîn** e.

H:(9/11)

3.4.2. Mem û Zîn

Mem û Zîn mesnewiyek evînî ya Kurdî ku bi terzê Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şîrînê hatiye nivîsandin. Ehmedê Xanî ew di sala 1693an de di 44 saliya xwe de xelas kiriye. Berhem ji 60 beş û nêzî 3000 hezar beytan pêk tê. Xanî, di gel ku çîroka evînî ya ku bingeha berhemê teşkil dike bi uslûbeke herikbar vedibêje; fikr û ramanên xwe, pîrsgirekên siyasî û civakî yên serdema xwe û taybetmendiyan çandî yên cîzîra 400 sal berê jî tîne ziman.

Xanî di berhema xwe de fikrên xwe yê di derbareyê realîteya kurdan, civaka wan, siyaseta wan, baweriya wan, çanda wan, felsefe û tesewufa wan de aniye ziman. Lehengên bûyerê; Mem û Zîn in. Ev destana evindariyê beriya mîladê ji di nav gel da dihate zanîn û taybetmendiyan wê yên mîtolojîk jî hene. Xanî, ev destana evindariyê aniye serdema xwe û bi azîneke nûjen hûnadiye û pêşkêşî gelê xwe kiriye.⁵³

Mem dil dikeve Zîn a xweha Mîrê Cizîrê. Lê belê Mîr bi telkînên menfî yên xizmetkarê xwe Beko, Zînê nade Mem. Ji bo ku bi hev re nerevin jî Memê dixê zindanê. Mem di zindanê de ji kedara xwe dimire. Zînê jî li ser vê cudabûnê debar nake û dimire. Li ser vê yekê jî hevalên Mem ji ber ku musebbibê veqetandina evîndaran e Beko dikujin û heyfa wan distînin.

⁵² Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiya Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, çapa 1ê, Stenbol 2013, r. 153.

⁵³ Sönmez, r. 130.

Gora herdu evîndaran îro li kêleka Mizgefta Mîr Evdal e û zîyaretgeha xelkê Cizîrê ye. Çapa ewil ya vê mesnewiyê di sala 1335an de li Stenbolê hatiye çapkirin. Heta niha gelek çapên din yên vê berhemê hene.⁵⁴

Havîn û payîz û bihar, Ya Reb rehmê bikî her car
Xulamê pir zeîf û jar, Şubhê **Memê** pir xemgîn e. H:(9/13)

Dîsa qafîya mer ser nûnê, Teşbîhê berfa kanûnê
Jin tê hebûn wekê **Zînê**, Xemgîn in ji derdê havînê. H:(8/8)

Qursincî li du cihên cuda van navên lehengên nemir bikar tîne û di herdu cihan de jî di heman wate û babetê de diemilîne. Di helbesta yekem de teşbîha xemgîniya aşîqê dildar dike; di helbesta duyem de jî teşbîha dilbera bedew, di derbareyê jinan de li ser heman tiştî dike.

3.5. UNSÛRÊN TEBÎETÊ: ÇAR UNSÛR

Çar unsûr, tiştên ku alemê pêk tînin in. Tê qebûlkrin ku ew çar unsûr, hakimê kesayeta mirovan e. Hemû bi hev re ji kaînatê kînaye ne.

3.5.1. Av

Av, rohn e, bê bêhn û bê reng e û şeffaf e. Taybetiya wê ya herî navdar jiyandayin e. Çavê evîndêr, kaniya herikbar e. Ava herikbar bejna heskirîyê ye.

Di wêje û civakê de tê gelek wateyan ji van ên herî navdar; rewac û rewaq, şeref, letafet, qedr û qiymet, feyz, ‘eta û rehmet dewlet û pêşketin, meqam û menzîl in. Her dem diherike. Ji bo durr û cewheran kînaye ye. Terkîbên herî navdar ku bi avê çêbûne ev in: Âva heyatê, ava kewserê, ava rewan.⁵⁵

Wextê adar tê b’şiliyan, Baran dibarî li hemî ciyan,
Şapê berfê diqetin ji çîyan, **Avê** di wan diçikîne. H:(2/15)

⁵⁴ Acar, r. 208.

⁵⁵ Acar, r. 137.

3.5.2. Ax

Ax, unsûra asta herî di jêr de ye û ji bo vê sedemê ew nîşana dilnizmiyê ye. Evîndar jibo yara xwe dibe xwelî û ew dixwaze evîna wî pê li wî bike û ew dixwaze bi rengê bibe xwedan qîmet. Ax cihê veşartina tiştên girîng û bi qîmetê ye. Ew di afirandina mirovan de madeyek herî muhîm e û dema mirov diire dîsan vedigere axê û dikeve binê wê. Yar dema evîndara wî dimire wî binax dike, lê bêhna evîndara wê li devdoran belav dibe û bêhna xwe dide xweliyê, ji wê xweliyê şerbik têne çêkirin û evîndar bi riya şerbikê dev û lêvên yara xwe radimûsîne.⁵⁶

Ax, bingeha jiyana her tiştî ye. Her tişt ya li ser axê û ya di bin axê de ye û gêradayê wê ye. Cihê veşartina tiştên girîng wek xezîneyan e. Ji ber ku tarî ye bi rengê reş tê behskirin. Nîşana dilnizmiyê ye. Ji ber ku di bin sê unsûrên din de cih digire.

Di tesewufê de ji bo nefsa mutmaîne kînaye ye. Ji bo îteatkariyê û tiştên bê qîmet tê şibandin. Bi terkîbên wek axa zelîl, axa tarî, ax bûn tê gotin.⁵⁷

Go **ax** û xwelî l'ser me, me çek û sîleh tunîne

Lewra gurê Îranê li me bûne devbixwîn e.

H: (4/4)

3.5.3. Agir, Ateş, Nar

Agir di hinek dînan de pîroz tê qebûlkirin, wesîleya pakbûn û cezadayînê ye. Agir bi piranî rengê xwe, bi germbûna xwe, şewitandina xwe, ronahiya xwe û bi xirabiya xwe tê behskirin.

Di wêjeyê de agir, êş û zehmetiya ku evîndar têda ye. Hesret û dûrbûna ji hezkiriyê wek agir e. Evîndar ji bo vemirandina wî, her dem ji çavan hêstiran dibarîne. Bi findê re têkilî tê çêkirin. Evîndar wek find, wek pirpirokê dixwaze têda bişewite. Herweha agir, ji şeytên kînaye ye.⁵⁸

Zilm zor e dinyayê de pir ar e.

Qiyametê cezayê zilmê **nar** e.

H:(1/21)

⁵⁶ Sönmez, r. 104.

⁵⁷ Acar, r. 138.

⁵⁸ Acar, r. 138.

Ew ne gur in gelê biran, bi şubhetê **agir** in,
Gelî û çiyar geriyabûn, wan riya xwe şaş kirin.

H:(4/14)

Qursincî li vir ji taybetiyên agirê teşbîheke xurtbûn û legengiyê dike, di wêjeya gelêrî de ji bo şexs û zarokên çalak, fenek û xebatkar bêjeya bi kurdî “Wekê gurê ye, Wekê agirê ye” bi piranî di nav gel de tê bikaranîn. Di helbesta yekem de pêyvya nar, Erebi ye û bi piranî ji bo cezayê uxrewî tê bikaranîn.

3.5.4. Hewa

Di helbestan de di wateya comerdî, lûtf û şevqata hezkiriyê de ye. Çavê ‘aşîqê tijî hêstir, dişêbe ewran. Bi wesîleya vekirina kolikan tê behskirin. Carinan bi xweşikaya xwe bi spîbûnê, carinan jî bi tirsandin û girtina rojê, bi reşbûna xwe tê qalkirin.

Ewrên tarî, bi rengê xwe yê reş pêşiya tiştan digre. Dema mirov xemgîn dibe rengê rûyê wî reş dibe, tarî dibe. Mîna ku ewrekî pêşiya çav û rû girtibe.⁵⁹

Zozanê me xweş bûn **hewa** serin e.

Ax û sed ax û sona wî mirin e.

H:(1/16)

3.6. UNSÛRÊN KOZMÎK

Unsûrên kozmîk, ew pêyvên razber yên di nav metnê de derbas dibin wekê roj, mihr qemer, burc û hwd. in.

3.6.1. Felek

Afirandina kaînat, esman, stêrk, gerstêrkên esmanan û keviriên dî yên esmanan, ji zemanên berê ve bala mirovan kişandiye. Her ku mirovan li ser van lêkolîn pêk anîne, bi derbasbûna demê re li ser van, şaxên zanistê çêbûne. Mirov ji ber tebîeta xwe ya fitrî, li ser wê yekê difikire ku tiştê asê û dûrî naskirinê meraq bike û wan pîroz bike, wesfê pîroz li wan bar bike. Lewra hêmanên astrolojîy, ji çaxên berê bi şûn ve bûne mijara mereqê û hewldan hatine kirin ji mewqîf û tevgerên wan re wate bêne derxistin; hetta ji aliyê hin qewman ve etfa

⁵⁹ Acar, r. 138.

îlahtiyê ji li van stêrk û gerstêrkan hatiye kirin. Esmen û hêmanên derbarê esman de ku di kitêbên pîroz, vegoteyên mîtolojîk û baweriyên gelêrî de ciyekî zêde berfireh girtiye. Di cureyên edebî de jî, bi awayekî zêde ji xwe re cih girtiye.

Zanisteke ku bi lê hûrnihêrîna esmanan re derketiye holê, îlmê astaronomiyê ye. Bi giştî astronomî, ew şaxazanistê ye ku li ser cism û cirmên esmanî yên mîna roj, heyv, gerstêrk û stêrkan dixebite, li ser avasazî, tevger û mezinahiya wan hûr û kûr dibê û dûrahiya navbera wan vedikole. Gelek nav li vî îlmî hatiye danîn. Digel ku bêhtir navê “îlmê felek” hatiye bikaranîn jî, navên mîna îlmê nucûm, îlmê hey’eti’l-‘alem û sinaetê tencîm û hwd., çend ji van navên wê ne.

3.6.2. Felek û Afirîna wan

Di hin ayetên cihêrengî ya Qur’ana Kerîm de, hatiye diyarkirin ku felek, ji heft tebeqan hatiye xuliqandin. Ayetek jê ev e: “Ma we nedît ku xweda, heft esmanan bi awayekî ku bi hev re di ahengê de bin xuliqandin?” (Nuh: 15). Di edebiyata klasîk de digel ku girîngî bi ayetên derbarê astronomiyê hatine dayîn jî, sîstema Batlamyûs, esas hatiye girtin. Li gorsîstema Batlamyûs, li der û dora dinyayê neh felakan cih girtiye. Di nav heft felekên ewil de, gerstêrkên, Heyv. ‘Utarid, Zuhre, Şems, Merih, Muşteri û Zuhalê hene. Piştî van gerstêrkan felaka heştan ku stêrk ango burc tê de ne tê. Felaka nehan, felaka dawî û felaka herî mezin e ku hemû felekan di nav xwe de dihewîne. Gelek nav lê hatine danîn. Kureya dorgir, feleka atlas, felaka azam û feleku’l-eflak, çend ji van navan in.

Tê bawerkirin ku vegera/zivirîna van hemû felakan û vegera dijraber a feleka azam û felekên din, li ser qedera mirovan bandor dike û şairên edebiyata klasîk, van vegeran wekê sedemên felaketên ku tê serê wan û sedemê wê rewşê neçê ya nebera wan û yarê wan dihesibînin. Ji ber wê ye ku gazinkirina şairan a ji felekê, di helbesta klasîk de bi awayekî zêde derdikeve pêşberî me.⁶⁰

Qursincî jî di nav metnê de gelek caran di bûyer û rewşên neyinî de pêyva felekê bi kar tîne.

Mela Eyûb wiha neke, Seba misilmanan neke

Gunehê xwe zêde meke, Ev دنیا çerx û **felek** e.

H:(8/6)

⁶⁰ Acar, r. 14.

Ew xanî xanyê şebab e, Dîk û mirîşk bûn kebab e
Digot Ehmed tu zû rabe, **Felaka** me pir xerab e.

H: (3/9)

3.7. UNSÛRÊN DEMÊ

Di edebiyata klasîk de helbesvanan unsûrên demê yên wek zeman, sal, hêyv, meh, hefte roj, şev, sibe, sipêdê, êvar, lêyl û fêsl (demsal) hem ji bo diyarkirina wextê û hem jî bi şiklekî muşahedekirinê rewşa tabîetê anîne ziman. Di van hêmanan de ji ber bê'eleqedarî û xemsariya evîndar, rewşa perîşan a ku aşîq di nav de ye çî qasî dirêj didome radixe ber çava.⁶¹

3.7.1 Fêsl û Eyyam

Bihar bû rojek ji **fêsl û eyyamê**
Melayên me rabûn qesta qiyamê

H:(6/1)

3.7.2. Bihar, Havîn, Payîz û Zivistan

Havîn û payîz û bihar, Ya Rebb rehmê bikî her car
Xulamê pir zeîf û jar, Şubhê Memê pir xemgîn e.

H:(9/13)

Wextê **bihar** tê li wan çîyan, Teşbîhê sûk û çarsîyan
Jin dimeşin serê çîyan, Diçine heliz û giyan.

H: (8/9)

Lewra zanim ku ev dunya bêbext e me ra xayîn e
Şevê reş in **biharan** baranên pir tarîn e
Ji êvarê heya sibehê tu tariyê da bimîne
Temsîla eqlê bide qebra tarî bi bîr bîne

H: (12/13)

Payîzê lêda dîsa dagerîyan
Ketin bin reşê kijûrê xaniyan

H: (1/17)

⁶¹ Acar, r. 153.

3.7.3. Şev û Roj

Şev û roj pir dikin sebrê,
Heta Xwedê rehmê bişine.

H:(2/20)

Ev çi ecêb e çi hikmet e, Seyyidê wan pir bi qîmet e
Şev û roj mêj û taet e, Nesla xwe ew Qureyşî ne.

H: (9/3)

Binêre Arifê serkar, Ji subhê heya be êvar
Şev û roj d'nav xem û xeyal, Lew Emînê wî nastîne

H:(9/14)

3.8. UNSÛRÊN HEYWANATÊ

Teşe û sîfetên heywanatê yên xweşik di helbesta klasîk de gelek cihan hatine bikaranîn.
Bi piranî heywanatên wekê bilbil, teyr, tûtî ne.

3.8.1. Çûk, Teyr, kew

Di edebiyata klasîk de çûk, bi navên “morx, teyr”ê di pêywenda ‘aşiq, can û dil tê bikaranîn û herwiha bi unsûrên mîna “qefes”, seyyad (nêçîrvan), pabend, gulşen, gulzar, gulistan û dane/tene yê hunera edebî ya tenasûbê tê sazîkirin. Di edebiyata klasîk de navên çûkên ku herî zêde derbas dibin bilbil/hezar, quling, şahîn, qaz, bûm, kebk/kew, zax, tezerw, tûtî, huma, enqa, şehbaz, perwane û qumrî ye.

Morx Farisiya çûk/teyrê ye. Di edebiyata klasîk de dil, can, çav û nêrînên aşiq dibin weke morxê. Hal û ehwalên aşiq ji destên evînê (ketina davikê, hêlîn çêkirin û şikestina baskên wî, hêsîrbûna di qefesê de... hwd.) dişibe teyrê/morxê. Çûk/teyr bi giştî di wextê seherê/sipêdeyê de diwîtin. Wîrandina teyrê sipêde (morxê seher) aşiq dixê nava xeyalan, dike ku êş û elema wî bê bîra wî.⁶²

Evarê kêyf û zewqa qîz û bûkan
Seherê wile wil û dengê çûkan⁶³

H:(1/9)

⁶² Acar, r. 155.

⁶³ çûk, çivîk

3.8.2. Bilbil

Di edebiyata klasîk de motîfeke herî zêde tê bikaranîn bilbil e. Bilbil aşîqeke dilbikil e û dinalê, wesfên yarê yên xweşik dibilîve. Bilbil aşîqê gulê ye. Dengê bilbilê yê huzunbaz û xweşik weke gotinên aşîqê ye ku bo yarê re daîm dinale. Hemû tevgerên evînbaziyên di navbera aşîq û maşûq de hene, di navbera gul û bilbêlê de jî derbasdar e. Gul bi hezar naz û îşweyan vedibe û xwe nîşanî bilbil dike. Bilbil bi dîtina delaliya gulê tê ziman û dilşadiya xwe dide der. Lê her dem jî bi dîtina “xar/stirî” (reqîb/dujmin) ku daîm bi gulê re ye diqehire, xemgîn dibe. Navekê bilbil jî “hezar” e û hem tê wateya hejmarê hem jî dibedêla bilbil de tê bikaranîn û bi vîna hunera “tevrîye”yê tê çêkirin. Navê bilbilê bi Erebi, endelîb e. Bilbil, endelîb, gul, gulşen, gulzar, gulîstan bi taybetî bi hev re tîkî bikaranîn û bi vî awayê hunera tenasube jî derdikeve meydanê.⁶⁴

Seherê gure gur dengê dewkîlan

Ber belekan xweş tê dengê **bilbilan**

H:(1/8)

Şubhê **bilbilê** seherê, Dixwînin wek xwîncîgerê

Ah ji destê esmerê, Şubhê şekir pir şêrîn e.

H: (11/7)

Şubhê seherê **bilbilan**, dixwînim ez baxçê gulan

Ah ji destê sorgulan, herkes yara xwe dihebîne

H: (11/5)

3.8.3. Teyrê Ribatê

Ribat, ji bo kewê tê bikaranîn. Kewê ribat kewê nêçîrê ye û heval û hemcînsên xwe dixwe dafikê. Ji ber vî taybetmendiyê di edebiyata Kurdî de gelek caran xwedî wateyê neyinî ye. Carinan bi sipehîtiya xwe derdikeve meydanê û weke yareke silok û nazende ye.⁶⁵

Deng û xwendina wî gelek navdar e. Him ji hêla dengê xwe ve him jî ji hêla dîmenê ve di nav nêçîrvanan de keweke bijarte ye. Di bêyta jêr de jî Qursincî xwendin û dengê vî kewê teşbîha xwe dike.

⁶⁴ Acar, r. 156.

⁶⁵ Acar, r. 157.

Guh bidenê gelê biran hûn xelkê vê civatê,
Şairek ji me rabû, şûbhê **kewê ribatê**
Dixwîne d'meclîsan da, her ziman û lûxatê H: (10/1)

Murada xwe xweş dikin ew ji xewan
Seherê qebe qeb û dengê **kewan** H: (1/10)

Wextê sibe tê li ser wan, Çûv û kapik li milê wan
Evraz diçin şubhê **kewan**, Jor da hemî bi piştî ne. H: (7/10)

Qursincî di malika jêr de teyrê sîsyakê di wateyê neyinê de bi kar anîye. Ji ber ku teyrê sîsarkê teyreke ne baş e. Nebaşbûna wê ji taybetmendiyê wê ya ji leşxwarinê tê. Ev cure teyr bi navên Sîmsiyark, sîsarik, sîsark tê zanîn.⁶⁶

Wekê **teyrê sîsyakê** serme da hatine xare.
Ya Rebb tu wan xelaskî ji destê gurê hare. H: (10/4)

3.8.4. Şêr/Esed, Piling

Şêr, şîr bi Farisî û kurdî; esed, bi Erebi ye. Piling jî ji famîlyeya pisîkan ên mezin e. Bi revîna xwe navdar e. Ji bo wezn û qafiyeyê bi hev re tîk bikaranîn. Leqeba Îmamê Elî ye, ew şêrê Xweda ye û gelek bi îhtîşam e. Ev ajal hem bi revîna xwe hem jî bi quweta xwe navdar e.⁶⁷

Qursincî di malikên jêr de hêz û quweta vê ajalê teşbîhê mirovan dike. Ev ajal di nav heywanatên dirinde de du taybetmendiyan girîng diheve. Quwet û revîna di pir kêman ajalan de herdu cem dibin. Ji vê hêlê ve wextê teşbîh hat kirin yan jî hêla hêzê ve yan jî hêla xizê ve teşbîh li ser mirovan tê kirin.

Şefîq digot ez axa me ,
Wek **şêrekî** li nav baxa me

⁶⁶ D. Îzoli, *Ferheng Kurdî- Tirkî Türkçe- Kürtçe*, Weşanên Deng, Amed, 2011, r. 537.

⁶⁷ Acar, r. 161.

Wez şîrîkê van daxa me.

H: (2/28)

Tê da hene rical û mêr
Berfê diqetînin şubhê **şêr**,
Reşkê wan kinf û hirî ne.

H: (2/25)

3.8.5. Sûleban/Rovî

Sûleban navê rovî ye bi Erebi ye. Rovî ajalek dirindeyê bi fendbaziye û bi zîrekbûna xwe tê nasîn. Bi taybetî di demsala zivistanê de li gundan bi zerar û zîyana xwe tê nasîn. Berê li gundan nêçîra vê ajalê jî hebû. Ji berku postê wî bi qîmet bû gelê gundiyan ji ber bazirganiya postê vê ajalê nêçîra wê dikirin.

Di metnê de jî li gelek cihan Qursincî qala zerar, ziyan û nêçîra vê ajalê dike.

Rovîk qudûs li wê hebû, Nêyarê Şebabê me bû

Tedbîra Şebab tunebû, Şebab haja roviyê nîne.

H: (3/2)

Xindînîs wî alê avê, Xanîk hebû l'serê taxê

Rovî ketne wî qonaxê, Jê tê fixan û gîrîn e.

H: (3/6)

Digotin Kamil rabe, tu eşîra xwe bîne,

Nêyarê me **rovî** bûn, bûn gurê devbixwîn e.

H: (4/6)

3.8.6. Gur

Gur jî dîsa ajalek dirindeyê bi xeternak e. Ev cure ajal jî bi piranî bi zîyana xwe ya li ser pezê gundiyan tê zanîn. Ziyana vê ajala dirindeyê carinan pir zêde dibe, ji ber ku ev ajal wextê dikeve nava pez, ne tenê yek heb an têra xwe nêçîr nake. Heke derfet bibîne hemû pezan dixeniqîne.

Ji ber zerar û ziyanên vê ajalê yên mezin û nêçîra wan, di nav gel de qîsetên wê gelek bûne. Di metnê de Qursincî li çend cihan qala gurê Îranê dike, wê demê hatiye bawerkirin ku ev cure gur ji Îranê hatine û bi mezinahiya xwe hatiye zanîn, bi bêjeyek herêmî weke “gurê qerese” hatiye bi nav kirin.

Sekn û sûkûna wî rûniştibû li derê dikanê
Ji ce'dê da dihatin diborîn ji pîr hem ciwanê
Behs û qise dikirin li ser **gurê Îranê**. H:(4/2)

Wextê diçin heliz û giyan, Çincîlê⁶⁸ wan li bin devîyan
Halê wan qet ne tu hal e, Şubhê halê **gurê** li çîyan. H: (8/10)

Ew jî nobe digrin ji tîrsa **guran**
Hîre hîr û dengê hesp û hêstiran H: (1/15)

Wekê teyrê sîsyakê serme da hatine xare.
Ya Rebb tu wan xelaskî ji destê **gurê** hare. H: (10/4)

Go ax û xwelî l'ser me, me çek û sîleh tunîne
Lewra **gurê Îranê** li me bûne devbixwîn e. H: (4/4)

3.8.7. Kêç û Pêşû

Binêre l'keyf û zewqa van zerîyan
Xilas bûne j'enwaê kêç û pûşîyan⁶⁹ H: (1/10)

3.8.8. Hesp û Hêstir

Ew jî nobe digrin ji tîrsa guran
Hîre hîr û dengê **hesp** û **hêstiran** H: (1/15)

⁶⁸ Çincîl: dergûş.

⁶⁹ pûşî: Pêşû, kermêş

3.9. UNSÛRÊN NEBATÎ

Nebatat ji gelek cureyan pêk tê û her yekê wê taybetiyeke xwe ya cuda heye; bêhn, dîmen û teşeyên wan ji bo helbestvan re bûye keresteyek. Helbestvan di nav helbestê de li ser nebatên bêhnxweş teşbîhan kiriye.

3.9.1. Gul/Çiçek

Di edebiyata klasîk de cureyên çiçekan bi reng, şekl û bêhnên xwe tene bikaranîn. Carinan bi mecazî unsûrên spehîtiya yarê jî simbolîze dikin. Sosin, bi pelên xwe yên tûj û dirêj balkêş e. Bi vê taybetiya xwe di helbestê dibe sembola zimanê yarê. Bi tûjîtiya xwe mîna xençerê, birhên yarê jî tê bikaranîn. Sosin hem bi şeklê xwe hem jî bi bêhna xwe çiçekeke girîng e. Di rêzikên Qursincî de jî bi bêhnxweşiya xwe û bi sîpêhitiya xwe teşbîh hatiye kirin.

Gul sembola spehîtiya yarê ye. Werd navê gulê yê Erebi ye. Di nav çiçekan de di nav, di edebiyata klasîk de herî zêde gul hatiye bikaranîn. Digel xonçe û xarê/istiriyê tê bikaranîn. Xar, reqîb e û herdem bi yarê re ye. Xar, carinan wateyeke tesewifî hildigre û di riya heqîqetê de tesîliyeta kêşandina bela, xem, cefa û kederên mutesewifan dike. Di edebiyatê de aşiq û meşûq, bi temsîliyeta gul û bilbêlê derdive pêş. Gul bi rengê xwe yê sor û bi bêhna xwe yê xweşik girîng e.⁷⁰

Bi zewq û ken û kêyfa çavbelekan

Ji bêhna **gul** û rihan û **çiçekan**

H: (1/12)

Heywan li terezênan da dimeşiyen

Pir zewq û kêyfê dikir ji **gul û giyan**

H: (1/13)

Muşerref ji **gulan** pir geştir, Bextê wî ji tali'ê reştir

Orek ji Mavekan nexweştir, Kes haja qederê nîne

H: (11/16)

⁷⁰ Acar, r. 163.

Şûbhê seherê bilbilan, dixwînim ez **baxçê gulan**

Ah ji destê sorgulan, herkes yara xwe dihebîne

H: (11/5)

Muhbeta wan ketiye dilan, Sed ax û keser û kulan

Wextê diçme **baxçê gulan**, Layiqê wan kes tûnîne.

H: (9/5)

3.9.2. Rihan

Wek gula avî jî tê zanîn. Di ava çem û golan de digihe. Rehên wê yên ji heriyên binê golan xwe dirêjî ser avê dikin û belgên wê dişibin dilan. Belgên wê madeyek mîna şimayê hatiye seyandin. Di mîtolojiya Hîndê de sîmgeyek afirandinê ye.

Reyhan/rihan bi bêhna xwe ya xweş û rengê xwe yê tîr bi porê yarê ve tê şibandin. Cureyek xweşnivîsiyê ku wek “reyhani” tê zanîn, navê xwe ji vê çiçekê wergirtiye.

Bi zewq û ken û kêyfa çavbelekan

Ji bêhna gul û **rihan** û çiçekan

H: (1/12)

3.9.3. Dar/Daristan

Di helbesta kalsîk de dar û ber hinek xusûsiyetên aşiq û meşûqan simbolîze dike. Dar û ber bi bêhn, şekl, çiçek û meyweyên xwe ve tene bikaranîn.⁷¹

Di malikên jêr de Qursincî unsûra darê di teşbîh û mecazeke de bi kar neanîye. Di wateya xwe ya rasteqîn de bi kar anîye.

Ew dike ku here zirzîq dikanê,

Tête navenda hundirê **daristanê**

Têne beriyê çend heb ji zarê wan began,

Derb û şelaq lê didin wek xudenferan.

H: (5/7)

Seralê heta sûlavê **dar** devî ne

Wellahî beg û kazikê xwe revîne.

H: (5/12)

⁷¹ Acar, r. 162.

3.9.4. Heliz, Zivrik, Giya

Piştîyan tînin li wan çîyan, **Heliz û zivrik û giyan**

Ew didine berx û miyan, Sekn û sukûn j'wan ra nîne

H: (7/5)

Wusyaq kaş e wek Êrûnê, Şubhê kewê ser hêlînê

Mêrê wan tev rûniştî ne, Jin diçin **heliz dirûne**.

H: (8/7)

Wextê bihar tê li wan çîyan, Teşbîhê sûk û çarsîyan

Jin dimeşin serê çîyan, Diçine **heliz û giyan**.

H: (8/9)

Wextê diçin **heliz û giyan**, Çincîlê⁷² wan li bin deviyan

Halê wan qet ne tu hal e, Şubhê halê gurê li çîyan.

H: (8/10)

3.10. ALAVÊN ŞER

Alavên şer, di nav helbestan de car caran di derbareyê nêçîr û şahîyan de hatiye bikaranîn. Ev alav wekê tiving, çek û sileh in.

3.10.1. Tivingê bêşliyan, Tiving

Tivingê bêşliyan cureyeke ji alavên bi agir e. Di nav gel de ji ber ku pênc heb fişeng hildide, weha hatiye binavkirin.

Xweş tê li me dengê **tivingê bêşliyan**

Kalîn ketibû li ser komê jinebiyan

H: (5/11)

Rabûn em çûne Mavekan, Digel yar û çavbelakan

Qet nayê dengê **tivengan**, Şîn e li we, şahî nîne

H: (11/10)

⁷² Çincîl: dergûş.

3.10.2. Çek, Sîleh

Çek, navê alavên bi agir ên gelemperî ye. Gelek cureyên wê hene. Bi fişeng û bi barûtê dixebitin. Di nav gel de, bi piranî ji bo cengê û ji bo nêçîrê tên bikaranîn.

Go ax û xwelî l'ser me, me **çek û sîleh** tunîne

Lewra gurê Îranê li me bûne devbixwîn e.

H: (4/4)

Çek û sîleh cevandin, nema teqîn û deng e

Lewra li me gundiyan nema sîma û reng e.

H: (4/12)

Roja ceng û perxaçê ew her du jî xwey **çek** in

Digotne Mamê Hirçê hûn mereqê qet nekin

Neyarê we me kuştin, du dêl in çar kopek in.

H: (4/16)

3.11. UNSÛRÊN DERBARÊ JIYANA ROJANE

Di nav van unsûran de navê ber û xwarinên rojane hatine ravekirin. Dexl, titun û birinc li herêma Qursinci ji bo debara gel karên sereke ne.

3.11.1. Dexl û Titun

Dexl û titun li herêma Hîzanê gelek digihijin û ji bo gelê vê derê debarek aborî ye. Taybetî gihiştina bera titunê, ji erdnîgarî û îqlîma herêmê re berek pir guncav e, lê amadekirina wê û zuhakirina wê pir zehmet e, ji ber vê qasê hemû kes nikarin vê berê biçînin û amade bikin.

Qerqîr wê da dibêjnê ûrûn,

Têda nayê **dexl û titun**,

Havîn xweş e ji penîr û rûn,

Lewra cihek pir şîrîn e.

H: (2/1)

3.11.2. Birinc

Birinc jî dîsa cureyek xwarinê yê navdar e, hema hema hemû xwarinên bi goşt re tê xawrin. Amadekrin û çandina vê cure berê jî dîsan gelek zehmet e. Ev ber di cihên avî de digihije û ji avê gelek hez dike, divê dewsa çandina vê berê gelek herî û bi av be.

Ev ber, li erdnîgariya herêmê hema hema bêje tenê li gundê Qursincê çêdibe. Ji ber ku av û çem û kaniyên vê gundê gelek e, ji berê ve ev cure ber tê çandin. Di heman demê de navek din ê Qursinc jî “Birincî” ye. Gelê herêmê di nav xwe de ji ehlê Qursinc re “Birincî” jî dibêjin.⁷³

Heçî ku Qursincî ne, Ser û bin tev **birincî** ne

Şek û şubhe ji wan ra nîne, Şubhetê eskerê Çîn e.

H: (3/5)

Sûqî û Sîvûr mezra wî ne, Li wê **birinc** pir danîne.

Her şev li wê nobetê ne, Tedbîra wan qet, tunîne.

H: (8/4)

3.11.3. Kebap

Goştê ku bi parçe parçe serê şîşê dixin, dibijêrin û sor dikan.⁷⁴ Cureyek xwarinê yê goştê ye, her dem û hemû kes nikare vê cure xwarinê bipêje. Ev cure xwarin tenê bi goştê sor tê amadekirin, lê di nav gel de bi piranî tiştên ku li ser agirê û hem jî bê agir sor dibin re jî tê bikaranîn. Di tesewûfê de û di helbesta klasîk de jî wateyên wê yên cihê hene.

Ew xanî xanyê şebab e, Dîk û mirîşk bûn **kebab** e

Digot Ehmed tu zû rabe, Felaka me pir xerab e.

H: (3/9)

3.12. ÇEND UNSÛRÊN CIH Î QEWMAN

Ev unsûr xasma di nav helbestên Qursincî de derbas dibin. Ji hêla têgihiştina wateyên helbesan daxuyaniya van unsûran girîng e.

⁷³ Jêder: Heypêyvîn, Said Yaraşlı, Dîrok. 21.10.2018, Bedlîs, Tetwan.

⁷⁴ Acar, r. 169.

3.12.1. Kelha Nemrut

Kelha Nemrut, di nav sînorên Tirkeyê de li bajarê Manîsayê xuya dike. Li gundê girêdayê Manîsayê bi navê Köselerê ye. Ev gund 49 kîlometre ji navenda Manîsayê dûr e. Li ser çiyayek asê û bilindir hatiye avakirin û dîroka wê heta salên berî mîladê sedsala 8'ê diçe. Ev der li anatolyaya bakûr Ji 12 bajarên antîk ên ku Herodot qala wan kiriye.⁷⁵

Sekinîne l'wan zozanên rût, Asê ne wek **Kelha Nemrût**,

Teşbîhê pehewan û hût, Herkes piştiyan dikişîne.

H: (7/4)

3.12.2. Ermenî

Ermenî, navê qewmek etnîk e, komek ji malbata hîndo ewropî ne. Nifûsa sereke ya bajarê Qerebaxê ne. Li gelek cihên dinyayê belav bûne û ji bilî nifûsa Ermenîstanê, li cihên din hejmara 5 milyonî hene.⁷⁶

Wextê mihaciriyê de gelek Ermen li erdnîgariya misilmanan de bi hev re jiyane. Piştî şerê cîhanê yê yekem, ji teşqe û tevliheviyên li herêmê pêk hatine vekişiyane Ermenîstanê û koç kirine.

Wextê havîn tê li wan deran,

Heyfa min tê li wan **Ermenan**

Ketine ber tozê bêderan,

Mêrê wan tev rûniştî ne.

H:(8/11)

3.12.3. Qureyşî

Qureyş navê qebîleya cenabê Pêxember e. Ji milê Mudarê ya Ednanîyan e û bi piranî tê qebûlkirin ku vê navê ji leqeba Fîhr b. Malik girtiye. Li gor fikrek din Qureyş navê wî, Fîhr leqeba wî bûye. Li gor fikrên derbarêyê danîna navê Qureyş, ji ber ku tê wateya “ cem bûn,

⁷⁵ T.C Kültür ve Turizm bakanlığı Manisa İl Kültür ve Turizm Müdürlüğü (2019), Nemrut Kalesi, [https://manisa.ktb.gov.tr/TR-73010/aigai-antik-kenti-manisa-merkez.html], r.1, Dîroka.g, 07.06.2019.

⁷⁶ Ermeniler (2019), [https://tr.wikipedia.org/wiki/Ermeniler], r. 1-2, Dîroka.g, 04.06.2019

hatina cem hevûdu, tîcaret kirin” ê ku ji koka takarruşê hatiye ku ev nav ji qewma Fihir B. Malik bi pêşengiya Kusayb b. Kilab li derdora Mekkeyê hatine cem hev û ticaretê kirine.⁷⁷

Ev çî ecêb e çî hikmet e, Seyyidê wan pir bi qîmet e

Şev û roj mêj û taet e, Nesla xwe ew **Qureyşî** ne.

H: (9/3)

Di nav misulmanan de kesên ku ji malbata Cenabê Pêxember hatine re Seyîd tê gotin. Ji ber ku bi neseben girêdayê nesla Cenabê Pêxember bûne. Qursincî di vê malikê de qala mêj û taetên van kesan dike û teqwaya wan vedibêje.

3.12.4. Aşiqê Cizîrê

Cizîr ji berê ve bi aşiqên xwe yê navdar, Mem û Zîn ve tê nasîn. Ev der, her tim ji vê ewayê ve bûye cihê aşiqên ku negihîştine hevdu. Ziyareta Mem û Zîn a li Cizîrê, ji berê heta niha ji aliyê aşiq û meşûqan ve tê zîyaretkirin.⁷⁸

Qursincî di malika jêr de bi gotina “aşiqê Cizîrê” etfa van evîndarên nemir dike. Nêçîr dildariyeke mezin û di heman demê wekê nexweşiyê ye ji bo nêçîrvanan. Qursincî eşqa nêçîrvanê yê bi nêçîrê ra, bi muqeyeseya aşiqê Cizîrê re dike.

Pir aşiq bûn wek **aşiqê Cizîrê**,

Gotin rabin em bi hev ra biçine nêçîrê.

H: (6/13)

⁷⁷ Casim Avcı (2002), “ben-i Kureyş”, *Diyanet İslâm Ansiklopedisi*, Weşanên TDV, Ankara, c. 26, r. 442.

⁷⁸ Abdullah Yaşın (2006), Cizre Kültüründe Mem û Zin, [<http://www.abdullahyasın.org/Makaleler/cizre-kltrnde-mem-u-zin>], r.1-2, Dîroka.g, 03.06.2019.

4. MENZÛMEYÊN MELA EBDULLAHÊ QURSINCÎ

ZÛGOTINÊN ŞAÎRÊ KURD

MELA EBDULLAHÊ QURSINCÎ

REHMETULLAHÎ ALEYH.



زگوتن شاعر کرد
ملا عبد الله قوسنی
رحمہ اللہ علیہ

JI GOTINÊN ŞAÎRÊ KURD, EBDULLAHÊ QURSINCÎ

H:(1)

4.1.Çûna waran

Di sala hezar nehsed heftê yekê
Bila guh bidin hûn hîkayetekî

Îsal dîsa wextê li me bû havîn
Em derketina çiyân, warê derewîn

Hindek zarok-sibyan bûn, hindek zilam
Derketin ji malan hemî xas û ‘amm

Hindek jê pêya bûn hindek jê siwar
Hindek jê helîm bûn hindekê dijwar

Hindek ‘adil in ew, hindek sabir in
Hezîran bîst û pênc me mal bar kirin

ژگو تن شاعر ر کرد عبدالله قرسجی رع

چونا وارا ①

ایضالا قزار نه هفتی یکی

بیرا که بدن هون حکایتی

ایضالا دینا وقتی بله بوها قین

ام دزگتنه دغان واری دروین

هندک زاروک صیان بوز هندک ظلام

دزگتن زمالان ههی خاص عام

هندک زری پیا بون هندک زری صوار

هندک زری حلیم بون هندک زری وار

هندک عادلین او هندک صابرن

خزیران پست و پنج مه مار بار کرن

Hindek jê geda bûn hindek pir wefa
Sêydayê li beriya wan Mela Mistefa

Wextê em derketine zozan û waran
Pir me dîtin ji enwayê jin û zaran

Seherê⁷⁹ gure gur dengê dewkîlan
Ber belekan xweş tê dengê bilbilan

Evarê kêyf û zewqa qîz û bûkan
Seherê wile wil û dengê çûkan⁸⁰

Binêre l'keyf û zewqa van zerîyan
Xilas bûne j'enwaê kêç û pûşîyan⁸¹

⁷⁹berbanga sibê

⁸⁰çûk, çivîk

⁸¹pûşî: Pêşû, kermêş

هَنْدَاكَ زِدْ كِدَابُونَ هَنْدَاكَ بِرُحُو وَفَا
سَيْدَايِ لَبْرِيَاوَانِ مَلَا مُصَلَفِي (برای درد)

وَقْتِي أَمَّ دَرَكْتَهُ رُوزَانُ وَارَانُ
بِرْمَه دِيَتِي زَانُوَاعِي زَنْدُوَفَرَانُ

سَحَرِي كَرِه كَرْدَنَكِي دَوْرَكَلَانُ
رَبْلَكَا نِ خَوْشَقِي دَنَكِي بِلِيلَانُ

بِنَارِي كِي نِي دَوَقَا قِي زُو بُو كَانُ
سَحَرِي وَبِلَه وَبِل دَنَكِي حُكَا نِ

بِنِيرَه كِي نِي دَوَقَا قَا نِ زَارِيَا نِ
خِلَاصُ بُو زَه زَانُوَاعِي كِي بُو شِيَا نِ


Murada xwe xweş dikin ew ji xewan
Seherê qebe qeb û dengê kewan

Bi zewq û ken û kêyfa çavbelean
Ji bêhna gul û rihan û çiçekan

Heywan li terezênan da dimeşyan
Pir zewq û kêyfê dikir ji gul û giyan

Me nêrîbû çîyan ji kevir û beran
Hokên û dengê şivanê koçeran

Ew jî nobe digrin ji tirsan guran
Hîre hîr û dengê hesp û hêstiran



مَرَادُ خَوْهٍ خَوْشِ دِکْنِ اَوْ رِخْوَانِ

سَخْرِي قَبْ قَبْ دَلْکَنِ کَوَانِ

بِذَوْقِ کُنْ وَ کِنْفَا جَا قِ بَلْکَانِ

زِبْهِنَا کَلُو رِیْحَانِ وَ چِچِکَانِ

حَيَوَانِ لِي طَرِزِ سِنَانِ دَادِ مَسِيَا

بِرِذْوَقِ کِنِی دِکَرِ زِکَلِ وَ کِلِيَا

مَه نِیْرِي بُوْدَا غَانِ زِ کَفْرُو بَرَانِ

هَوِ کِسِ وَ دَنْکِي شِشْقَانِي کُو حِرَانِ

اَوْزِي نُوْبِي دِکَرِنِ زِ طَرِ سَاکَرَانِ

حِيْر حِيْر وَ دَنْکِي لَقْسِي هِسْتِرَانِ


Zozanê me xweş bûn hewa serin e
Ax û sed ax û sona wî mirin e

Payîzê lêda dîsa dageriyan
Ketin bin reşê kijûrê xaniyan

Bitirsin bilerizin ji Xwedayê mezin
Xafil qet kesek nemînin mêr û jin

Xweyê vî meqalê bizanin kî ye
Ebdullah ji gûzê ket wesiyeta wî ye

Zilm û zorî nekin li kesê gundiyan
Belkê hûn xilas bin ji zebaniyan



زورانی مه خوش بو هواسر نه ^{germ nane}
آخ صواخ سوناوی میر نه ^{danwiga}

پاپیزی لدان دیساد کریان
گتس بن رش کزوری خانیان

بترسین پلریزن رخدای مذن
غافل قط کسد نیمین میروژن

خوس فی مقالی بزانی کیه
عبدالله زگوزی کت و صیتاوریه

ظلم ظوری نکن کسی کندیان
بلگر هوز خلاص بن ترز بانس یان

Zilm zor e dinyayê de pir ar e
